

Dewlet dev ji diffimraffiyê,  
 Kur'd ji dev ji doza xwe bernadin



Hevpeyîn bi humermend Ehmed Qileç re  
**Huner bi xwe pirsek e**  
 divê humermend jê re  
 bibe bersiv

Rüpel 8 - 9

Nûçeya S. TAN  
**Edî kurd ji dibin**  
 xwedan  
 ansiklopedî

Rüpel 11

Kezebşewitiyekî  
**welat:**  
**Vedat Aydin**  
 Gotara S. TAŞKESEN

Rüpel 4



S. Taşkesen: Kezebşewiti-yekî welat Vedat Aydın

4



M. Darebî:  
Şehid nemir in

7



Ahmet Önerge: Bila kurdî bi alfabe Brailê jî bê nivîsandin

10

## Jî Xwendevan

**EM** girtiyen Girtîgeha Bartinê vê rojnameya me ya birûmet û dengê gelê xwe, bi kefxwesi û dilzahî dixwînin. Bi rastî roj bi roj nivîse birûmet tenê weşandin. Xwestek û daxwazén me, ev e ku ji bo zimanekî neteweyî gelê me hemû vê rojnameyê bixwîne û bide xwendin.

Em silavên xwe yên şoresgerî ji we re dişin. Bimînin di xweşiyê de.

ŞEVKET KAHRAMAN

**EZ** pêsi silavên xwe yên dilgermî pêşkêsi we dikim û di karê we yê pir birûmet û pîroz de serkeftinê dixwazim. Ez ji despêka derketina rojnameya Welat û vir de xwendevanekî Rojnameya Welat, Welatê Me û Azadiya Welat im. Lê mixabin li gorî mercen ku ez tê de dijim pir caran rojnameya min negihîtiye destê min û ez ji xwendina wê bêpar mame.

Ez vêga di zindanê de me û ev bêimkanî hêj zêde bûne. Lê li gorî imkanen xwe min rojnameya xwe ya hejmara 21'an gihande destê xwe û min xwest bi vê imkanê jî tekiliyan bi we re çekim.

Ez dîsa ji we hemûyan re silav û hurmeten xwe pêşkêsi dikim û bi hêviya rojén azad serkeftina we dixwazim.

FEHMİ SÜSLÜ/WAN



## Li ser derneketina me çend gotin

MEHMET GEMSİZ

**J**iyan têkoşîn bi xwe ye. Di vê têkoşînê de tiştîn ku ji nişka ve diqewimin hene. Mirov bêamadehî tê qefaltin. Ev rewseke siruştî (tibii) ye. Her wiha di qonaxa vê têkoşînê de jî, grafik geh bilind dibe û geh jî dadikeve. Li vir tiştî herî girîng ew e ku, têkoşîn û tevî wê têkoşer ji riya xwe averê nebe.

Îcar em wekî rojname, ji rewşa gelê xwe ne cihê ne. Tiştîn ku di vê têkoşînê de têne serê gelê me, tenê serê me jî. Astengen ku derdikevin pêsiya wî, derdikevin ber me jî.

Di nav me kurdan de gotineke wiha heye: Qezayê da ser belayê!

Ji we xwendevanan re jî diyar e ku, di vê mehê de ci tiştan rûdan. Büyerên di kongreya HADEP'ê de û kuştin û girtina rîveber û endamên wê, pişt re rawestandina weşana MED-TV'ê û li dû wan jî du hefte li ser hev derneketina rojname-

ya me. Van her sê büyerên girîng da dû hev.

Sedemîn büyerên di kongreya HADEP'ê de û rawestandina weşana MED'ê tê zanîn. Em hewce pê nabînin ku di vî quncikî de careke din li ser wan rawestin.

Bêyî vîn (îrade) û hemdê me, em du hefte li ser hev nikaribûn derkevin. Gelşâ me ya ku bû sedemîn derneketinê jî, bêderfetî bû. Li gorî peryoda ku em derdikevin diviya ev hejmara me ya 27'an bûya. Lê em hejmara xwe ya 25'an ançax di navbera mîjuya 7 û 27ê tîrmehê de derdixin.

Em tekane rojname ne ku xwerû bi kurdî û heftiyê carekê derdikevin. Li bâkûrê welêt rastiya me ev e. Ji hêla din ve, em ne di merc û hoyen asayî (normal) de weşana xwe didomînin. Me di destpêka nîvîs de jî got ku, jiyan têkoşin e.

Di vê têkoşînê de gemaro û çeper li ser û dora gelê me hene. Em jî di vê rewşê de li ber xwe didin. Ev çeper û gemaro piralî ne. Hem aliyan wan ên siyasi û hem jî yên aborî hene.

Li vir, em dixwazin der barê firotina rojnameya xwe de jî tiştinan bibêjin. Çendî ku cografyaya ku Azadiya Welat lê belav dibe mezin û fireh be jî, em %50 li Stenbolê û %25 jî li bajarêne wekî Edene, Îzmîr, Mersîn, Enqere û hwd. têne firotin. Hejmara mayî jî li deverên din.

Hejmaren li jorê, der barê van gemaro û çeperan de, agahiyeke zelal didine me.

Digel van yekan, divê ku em hinik be jî, li xwe binêrin. Bi taybetî cemawer û girseya ku me ew ji xwe re armanc (hedef) hilbijartîye. Bi qasî ku di gotinê de em li hêjâhî, sazî û têkoşîna xwe xwedî derdikevin, di pratîk de ev yek nîn e. Pi-rezê li ber çavan e. Şirove jê re ne pêwist e.

Ji bîra me neçe, bi qasî ku em li ber xwe bidin, em dê ew çend li piyan bimînin

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de.

## Kongreya HADEP'ê û pêla şovenîzmê

**P**artiya Demakrosiyê (DEP) di 16'ê pûspera 1994'an de hat girtin û parlamenteñerîn DEP'ê cezayîn giran ên nemeşrû xwarin, di 11'ê gulana 1994'an de Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) damezrand. HADEP'ê di 26'ê pûspera 1994'an de, deh rojan pişti girtina DEP'ê, kongeraya xwe ya yekemîn li Enqereye li dar xist. Di kongreyê de 15 hezar kurd besdar bûn. Ev hejmara bersîva girtina DEP'ê bû. Kurdan bi cil u berg û tengen xwe yên neteweyî kongre bi serkeftin û çoşake mezin kirin qada dilan û serhildanê.

Pişti vê kongreyê rîveberiya şerê qirêj êrîşî HADEP'ê kirin. Rîveber endam û alîşîgîren HADEP'ê hatin girtin, işkence kirin, kuştin û windakirin. Bi van kirinan jî dewleta kontr-gerîla dixwest HADEP'ê bitîrsîne, ji hêzê bixe, bikişîne nav çarçove û tixûbîn sistemê û teslim bigire.

Li aliyekeşî şerê taybetî ev hesab dikişin, li rîxê din jî HADEP'ê bi kongreya xwe ya duyemîn bi besdariya sih hezar kurdî ji berê hîn xurtîr, bi hêzîr, bi rîexistin û li ser xeta xwe bi israr derket pêşberî şerê taybetî. Harbûn û êrîşkariya wan ji ber vê yekê ye.

Ji agirbesta PKK'ê ya yekalî ku di 15'ê berfanbara 1995'an de hatibû ilan kirin û vir ve operasyon û êrîşen dewletê bêrawestan her berdewam bûne û di vê dema dawî de jî xwest bikeve başûrê Kurdistanê lê li hemberî berxwenda gerîla neçar ma ku bi paş ve bizi-vire. Ev hemû êrîş operasyon û suikasta li dijî Serokê Giştî ye PKK'ê Abdullah Öcalan vala hatin derxistin û bêen-cam man.

Rejîma şerê taybetî êdî baş têgîhişt ku li pêşberî gerîla nikare gav biavêje,

**Ew mantalîta ku ji alîn gelê din re dibêje "perçeyek pot", dikare ji ala xwe hez bike ? Heke ew ji ala xwe hez dikin, çima wekî hemû nirxên civakê, wê qirêjî dikin? Ger ev al ji bo kurdan tê wateya şewtandin û valakirina gundan, koçberî, kuştin û winda-kirinê berpîrsen vê kî ne?**

ROBİN REWŞEN

ji ber vê yekê jî, berê xwe da HADEP'ê, dîlîn şer, malbatên girtî û windayîyan, rîexistinê gel ên sivîl û demokratîk. Welê xuya dike ku dê di dema pêsiya me de dewlet van êrîşen xwe gurtir û bêhtir bike. Gotineke me ya pêsiyan heye: "Nikare bi kerê dibeze kurtan." Rewşa dewlefe ev e.

Provakasyona alê li dijî HADEP'ê ji mîj ve ye hatibû amadekirin. Heke al nebûya bêguman problemeke din peyda dikirin. Ez dixwazim çîroka gur û berxikê bînim bîra we. Rojekê gur rasî berxikê tê û dixwaze wê bixwe. Lê beriya ku bixwe, divê sedemekê peyda bike. Gur dibêje berxikê: "Te par çêrê min kiribû." Berxik bersiv dide û dibêje: Par ez hîn hatibû ser rûyê dînyayê û di zikê diya xwe de bûm."

Pişti kongreyê sê delegeyên HADEP'ê ku li nêzîkê Pinarbasîyê kemîn li pêsiya wan hat danîn û hatin şehîdkirin, kanaleke televizyonê ya şerê taybetî bi xwe got ku ji Enqere hatine taqîb kirin. Ev jî dide xuyakirin ku dewleta mafya ji bo kuştina HADEP'îyan tîmekî kontr-gerîlayî jî amade kiriye.

Heta em bibêjin xeşîmekî, naşiyekî an yek ji wan heft sed polîsîn di salonê de, çû ew al daxist jér, gelo ev dikare bibe argûmenta kuştina HADEP'îyan, girtina bi dehan birêveberan û birîndarkirina bi dehan? Gelo ev çavşorî, ji bîli Tirkîyê li ku heye?

Ev demek bû ku pêla şovenîzmê hînekî sist bûbû. Rejîmê bi pirsa alê re xwest pêla şovenîzmê bilind bike û çi ji dest hat, texsîr nekir. Hinek rebenênu ku navê sendîka û konfederasyonê kar-keran li xwe dikin, bi bayê bezê tevî vê pêla şovenîzmê ya hîsterîk bûn. Lê ya ku mirov xemgîn dike, hinek kesen komünîst, sosyalîst û pêşverû ku xwe dost û nêzîkî vê tevgerê dibînin, bi rengekî çewt û reaksiyoner nêzîkî vê pirsa han dibin. Ew mantalîta faşîst û nîjadperest a ku tahamûla alîn gelê din neke û ji alîn wan re bibêje "perçeyek pot", gelo dikare ji ala xwe hez bike û di vê hezkirinê de dilsoz be? Heke ev hezkirin alê (şerê taybetî û faşîstên sivîl) ew qas ji ala xwe hez dikin, çima wekî hemû nirxên civakê yên din qirêj û dejenerî dikin? Heke ev al ji bo kurdan tê wateya şewtandin û valakirina gundan, koçberî, işkence, kuştin û winda-kirinê berpîrsen vê yekê kî ne?


Bi awayekî prîmîtv û sexte xwepê-sandanen alê li dar dixin, li mal, dikan û avahiyen fermî alan dadileşin û dixwazin xwe û vê rejîma xwe ya kontr-gerîlayê veşerîn. Tirkîn bînamûs, dilsoz û pêşverû beriya her tiştî divê nehêlin ku rejîma şerê taybetî alê wisa qirêj bike û şerê qirkirinê bidomîne. Lê tiştîkî ji bîr dîkin.

Gelê kurd di warê xebata siyasi ya legal de, berdîleke mezin daye, ji sedi bêhtir şehîd dane, heta iro hatiye. Wisa bi hêsanî dev jê bernade.



**Li gorî** anketeku ku bi destê 'Stratejik Araştırmalar Vakfı' çêbûye, piştgiriya ji bo Partiya Gel a Demokrasiyê (HADEP) zêde dibe. Nivîskarê rojnameya Milliyetê Güneri Civaoglu roja 16'ê tûmehê di quncikê xwe de cih da encamên ku bi vê anketê derketine holê. Civaoglu li gorî encama vê anketê dide zanîn ku partiyen weki CHP û DSP'ê hêviyê nadîn gel, di dewsa wan de partiya aleviyan Tevgera Demokratik a Aştiyê û HADEP xurt dibin.

Li gorî encama vê anketâ herfî dawîn, li baskê rast jî xurtbûna RP'ê didome, lê Partiya Riya Rast (DYP) piştgiriya xwe winda dike.



**NIVİSKARÊ** Rojnameya Yeni Yüzyıl'ê Ahmet Altan di nivîsa xwe ya 17.7.1996'an de li ser qewimînên dawîn radiweste û dide zanîn ku jêderka hemû nexwesîyan şerî li Kurdistanê ye. Nivîskarê navdar Altan piştî ku serdestiya MGK'ê ya di qada siyasi de bi bîr dixe, nivîsa xwe wiha didomîne:

"Li Tirkîyê hin polîs dibine endamê çeteyan, hin jî li meydana êrişî ser rojnamevanan dikin, wan didin ber jopan. Ev jî nişan dide ku sîstem dirize. Jêderka pirsgirêkîn Tirkîyê şer e, heta ku ev şer neyê sekinandin, tu pirsgirêk jî nayê çareserkirin."

## NÛÇE

# Dewlet dev ji dijminatiyê, kurd jî dev ji doza xwe bernadin

**D**i dawîya meha pûşperê de Partiya Refahê gîhişt mirazê xweyi 30 salî. Heke mirov bi awayê ku hin kes dibêjin bi nav bike, hikûmeta 'Örtülü Mercümek' ango Mercümek nuxamîf ava bû. Lî hin di destpêkê de Serokê RP'ê Necmettin Erbakan da zanîn ku wê hikûmeta wî li ser rîça MGK'ê bimeše. Di 30'ê pûşperê jî de gerîlaya ARGK'ê Zilanê li navenda Dersimê bombe di canê xwe de teqand. Bi vê teqînê li gorî daxuyaniyê fermî 7 leşker mirin bi dehan jî birîndar bûn. Keça kurd Zilanê berî ku çalakiya xwe pêk bîne, kasetek dagirtibû, di vê kasetê dida zanîn ku dewleta tirk ji bîlî kuştinê tiştekî nizane, lewre jî wê wekî bersiva 'gelekî bêwelat' ev çalakî pêk anîye.

Vê bûyerê piştî provokasyona alê dengékî mezîn veda, çapemeniya tirk li ser derûniya gerîlaya ku çalakî pêk anîye teoriyên sosret afirandin, lê nikaribûn bandora livbaziyê kêm bikin.

### Bihuştâ RP'ê

### Girtîgeha Eskişehirê

Hikûmeta Erbakan û Çillerê piştî ku dengê pêbaweriyyê girt, dest bi avêtina hin gavan kir. Pêşî ji sedî 50 mehmîzîn karmandan zêde kir, lê sendikayê karmandan bi vê yekê qayil nebûn, da zanîn ku ew dixwazin bi riya bazara peymana giştî mehmiza xwe destnîşan bikin.

Gava duyemîn Wezîrê Karê Dadiyê Şevket Kazan avêt. Wî hin nameyên giştî (tamîm) yên Mehmet Ağar ji holê rakirin, lê di bingehê zêde tiştek neguhert, ji ber vê yekê jî li gelek girtigehan grevê birçibûnê û rojiya mirinê hê jî dom dikin. Niha 207 girtî li ber mirinê ne, Wezîr Karê Dadiyê Şevket Kazan piştî vê yekê got: "Tiştekî ku ez bikim nemaye." lê çû Girtîgeha Eskişehirê ku girtî jê re dibêjin, 'goristan' û sedema sereke ya grevan e, ew der wekî bihuştê bi nav kir.

Piştî ku ev mesele jî 'çareser' bû, hikûmetê içar dest avêt kêşaya kurd. Bi milyonan kurdên ku koçber bûne di nava çend rojan de li gundêni wan vegerandin. Erbakan piştî Konyayê berê xwe da Elezîz û Bingolê,



li wê derê da zanîn ku wê gundiyan li gundêni van vegebine. Li ser vê yekê Wezîrê Karê Hundîrîn Mehmet Ağar idia ku li Sîrt, Amed û Bingolê 11 kes vegebine gundêni xwe, ci heyf ku waliyên wan bajaran daxuyandin ku gotina Ağar nerast e.

Çapemeniya ku vegebine çend malbatên cerdevanan wekî destpêkirina vegeberê nişan didan, piştî daxuyaniyê waliyan wan bajaran, ji bêgavî cih dan hin rastiyân. wekî mînak Serokê Komisyonâ Jérîn a Lîneya Şêwirkariyê ya Destnedana Avahîyan ku niha ji holê rabûye Tahir Hatipoğlu dibêje: "Çekan didin destê kesen ku dixwazin vegeerin û wan bi darê zorê dikin cerdevan."

Dîsa Wezîr Mafen Mirovan ê berê Algan Acaloglu ji daxuyaniyek da û diyar kir ku hêzên ewlekariyê nehiştine ku ew projeyen vegeberê pêk bînin. Niha çapemeniya tirk Mehmet Ağar di warê hejmara kesen koçber de jî derewkar derdixe, tê gotin ku hejmara koçberan ji dibe ku ne wekî gotina Mehmet Ağar 350 hezar, lê wekî ku di raporê İHD'ê tê diyarkirin 2,5 milyon be.

Helwesta rayedarê Amerîkayê ya li hemberî hikûmetê ji gelekî balkêş bû. Rayedarê amerîkî, pêşî dan zanîn ku gotin ne girîng e, lê kirin girîng e, paşê her hal bi çewtiya xwe hesîyan û gotin "peyvîn ku mirov dike jî girîng in", di dawîye de gotineke hêjayî pesnê kirin, "ji bo me laştî pêwist nîn e, lê demokrasî û bazar serbest pêwist e." Berevajî gotin û

danezanîn fermî, di çapemeniya amerîkî de rexneyen tûj li hikûmeta nû, bi taybetî jî Tansu Çillerê hatin girtin. Tê dîtin ku baweriye kesî bi Çillerê nayê, ji ber ku RP koza wê ya sereke bû li hemberî amerîkî ewrûpiyan, lê niha wê bi xwe ew anî ser kar.

### Komara tirk nahêle ku alîkarî biçe Başûr

Hikûmeta nû di warê kêşaya kurdî de tiştek neguhert, ji bilî gotinê bêbingeh. Hê di dema hikûmeta Anayolê, rayedarê dewletê diyar kirin ku ewê kana-leke kurdî vekin, da ku li dijî MED-TV propoganda dewletê bike, lê dema li Amedê tv'yeke taybet (Can TV) xwest bi kurdî weşanê bike, DGM dest avêt kir. Li hêla din, tê gotin ku RP'ê bi Bizûnewey Kurdistan re peyman çêkiriye, da ku li Başûr bi alîkariya RP'ê kanalekê veke û li dijî MED-TV propogandaya oli bike.

Dewleta tirk ne bi tenê dijiminatiya kurdên Bakur dike, her wiha, ji bo ku çepêrê li kurdên Başûr teng bike jî ci jê tê, dike. Heta tê gotin ku dewleta tirk rê nade rîxistinê li derveyî dewletan (NGO) da ku alîkariya mirovî bigîhînîn Başûr. Komeleya Alîkariya Navneteweyî (IRA) ev sê meh in bi barê 6 keştiyan derman anîye ji bo ku derbasî Başûr bike, lê ji 9'ê gulanê bi vir ve bender û deriyê sînor dirizin. Dîsa dewleta tirk rê nade 150 rîxistinê insanî ji bo ku telefonen peykî (satellite) derbasî Başûr bikin. Di gel van tiştan balafîren komara tirk her roj diçin gundê Başûr bombe dikin, gundiyan dikujin, heta firokeyen tîrkan, hin caran gundiyan Rojhîlat jî bombe dikin. Dîsa yek ji mercen ku Serkana Giştî ya Tirkîyê dâniye ber Amerîkayê ji bo dirêjîkirin maweya Hêza Çakîç, girtina Kampa Etrûşê ye. Hebûna cihekî ku bi hezaran zarokên kurd bi zimanê xwe perwerdehiyê dibînin, li hesabê wan nayê.

### Kurd aştî û çareseriyê dixwazin

Li gel van hewlîn dewleta tirk, kurd û dostên kurdan jî destvala nasekinin. Di navbera 3-5'ê tûmehê de li Bonnê konferanse li ser kêşaya kurdî li dar ket. Vê konferansa ku bi pêşengîya Medico International û hînek rewşenbîrên alman pêk hat, sê rojan dom kir. Di dawîya konferansê de daxwaza çareserîya siyasi hate dubare kirin. Her wisa jî biryara gurkirina çalakiyê ji bo çareserîye hate girtin. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji konferansê re mesajek şand û da zanîn ku ji bo aştiyê danîna çekan jî di nav de, ci bikeve ser wan ewê xwe jê nedîn paş.

Li aliye din di 15'ê mehê de li paytexta İtalya Romayê Komcivîna 5'an a PKDW'ê dest pê kir. Komcivînê 3 rojan dom kir û Yaşar Kaya ji nû ve wekî serok hate hilbijartin. Di gel piştgiriya ji bo aştî û diyalogê PKDW'ê hin biryaren der barê xazî û malbatên şehîdan de girtin. Serokê PKK'ê Öcalan bi mesajekê besdarî komcivîn bû, xwest ku gavêni ji bo parlementoyeke neteweyî bîn avêtin.

SAMÎ BERBANG



# Kezebşewitiyekî welat:

Vedat Aydın ji helbestan pir hez dikir. Piraniya helbestên  
mamoste Cegerxwîn ji ber zanibû, li Ciwan Haco,  
Aramê Tigran û li Mehemed Şêxo guhdarî dikir.  
Kurdiya wî gelek baş, axaftina wî zelal û nerm bû,  
nivîsên xwe jî bi kurdî dînîvîsandin.

**R**ewşenbirê kurd Vedat Aydın di 5'ê tîrmehê de nîvê şevê, ji hêla "kesên ku xwe wekî polîsên sivîl" dabûn naskirin ve, ji malê hate hildan. Piştî 3 rojan cendekê wî di navbera riya Amed û Madena Mazrayê (Elezîz) de hate dîtin.

Di 10'ê tîrmehê de, ji dema ku Amed bûbû Amed rojeke wisa nedîtbû, erd û ezman bi rengê kesk û sor û zer xemîlbû. Wê rojê sed hezar mirov besdarî cenazeyê wî bûn. Serhildaneke bi vî rengî dewlet xistibû nav tirseke mezin. Jî bi awayekî hovane gelê kurd hate gulebarankirin û 11 kes jî wê çaxê bûn mîvanê Vedat. Bi sedan birîndar çebûn û ew qas jî girtî û windabûyî.

Vedat mirovekî jîr û çeleng bû; kesen ku ew nas dikirin her dem behsa fedakariya wî, mîvanperweriya wî û evîna wî ya ji bo welêt dikirin. Bawerîya tu kesî bi kuştina wî nedihat; jiyanekî wî ya li derveyî şoreşê tune bû. Wexta wî têrî nedikir, ji ber vê yekê wî nikaribû ji bo malbata xwe û zarokênen xwe terxan bike. Karê wî gelek bû, hetanî serê sibehan dînîvisand, dixwend û difikirî.

## Rewşa gelê xwe tu car ji bîr nedikir

Gelê wî yê bindest û perişan tu carî ji bîra wî nedîcû. Her dem ev pirs ji xwe dikir: "Gelo çîma û ji bo çî?" Her dem ji mirinê re amade bû. Ji ber ku gelek caran digot: "Ez tu car di nava nivinan de namirim." Ew bi jiyanê re gelekî girêdayî bû, ji gul û kulîkan gelek hez dikir. Erd dikola tov diavêtin navê, av dida û li benda şînbûnê dima.

Çawa hez ji zarokênen xwe dikir, wisa jî hez ji jiyanê û mirovahiyê dikir. Serê sibehan zû radibû, bi çikaçika çivîkan derdiket û bi mirovan re eleqedar dibû. Derdê wan derdê xwe dihesiband.

Ji helbestan pir hez dikir. Piraniya helbestên mamoste Cegerxwîn ji ber zanibû, li Ciwan Haco, Aramê Tigran û li Mehemed Şêxo guhdarî dikir. Kurdiya wî gelek baş, axaftina wî zelal û nerm bû, nivîsên xwe jî bi kurdî dînîvîsandin.

Tirsa ku di dilê gelek însanî de hebû, pê re tune bû. Mesela gava cenazeyek, meşek an jî mitîngîk çebûya gelek kesî ji birayê xwe re an jî, ji miro-



## Kurtejiyana wî

Vedat Aydın di sala 1953'an de li gundê Kurdheciya Bismila Amedê hate dinê. Perwerdehiya xwe ya sertayî, navendî û amadehî li Bismilê qedand. Enstîtuya Perwerdehiyê (Eğitim Enstitüsü) ya Diyarbekirê şaxa Edebiyatê di sala 1974'an de kuta kir. Piştî cuntaya leşkerî ya 12'ê rezberê hate girtin û 4

salan di Zîndana Amedê de ma. Tevî işkenceyên giran jî, di dema berxwedana Girtîgeha Diyarbekirê de di refen pêş de cih girt. Piştî berdانا xwe ket nava xebata rîexistinkirina Komeleya Mafêن Mirovan (İHD). Di sala 1990'an de bû endamê birêve-beriya İHD'ê û bi dehan car hate binçavkirin û işkencekirin.

Cara dawî di 28'ê kewçera sala 1990'an de ji ber ku di danişîna kongreya İHD'ê de bi kurdî axivî hate girtin. Di dawiya sala 1990'î de ji bo Serokatiya Partiya Keda Gel (HEP)'ê hate hilbijartin. Vedat Aydın, zewicî û bavê 3 zarokan bû.

# Vedat Aydin

vîn xwe re digot:

"Tu neyê, wê ci bibe ne diyar e."

Lê belê Vedat di bûyereke wiha de digot:

"Va ez diçim, kesê bixwaze bila li pey min were."

Dema mirovekî wîbihata, bigota "Êdì bes e Vedat, tu westiyâî, bîhêle bila hinek kesen din bikin" ew gelek hêrs dibû û digot:

"Ma me heta vê gavê ci kiriye?" û peyvîn xwe wiha didomandin:

"Kesê ku bi rastî ji bo vî welatî xebatê dikin, li serê çiyan di bedenê xwe de bombeyan diteqînin, lê ev yek jî bi me nabe."

## Wî qet guh nedida mal û milk

Malbata Vedat Aydin, li herêmê bi dewlemendiya xwe dihate naskirin, lê belê ji bo Vedat Aydin dewlemendî ne girîng bû. Ji ber vê yekê jî, wî tu car rewşa aboriya malbatê ji xwe re nekir bar û piştî. Di mijûlahiyeke ku di navbera wî û bavê wî de derbas bûbû de Vedat wiha gotibû:

"Eger fersend bikeve destê min, ezê vî mal û milkê te bifiroşim û li feqîran belav bikim."

Vedat jiyanâ xwe bi welatê xwe ve girê dabû û mirov zû dikete bin bando-ra wî. Di demen jiyanâ herî zor de ji Vedat her tim devlikene bû...

Ji ber van taybetiyê wî jî gelê kurd tu carî ew ji bîr nekir. Tişte ku hêzên kontrayî dixwestin bi kuştina wî pêk bînîn, hê di destpêkê de têk çû. Rejîmê dixwest bi kuştina wî çavên rewşenbîrên kurd bitîrsîne, wan ji riya şoresê bike, lê gelê kurd bi serhildaneke dîrokî bersiv da wan û diyar kir ku bi kuştinan gelê kurd dev ji doza xwe bernade.

Di salvegera 5'an a kuştina wî de, gelê kurd ew bi çalakiyê cur bi cur bi bîr anî. Roja 10'ê tîrmehê komek endamên HADEP'ê çûn gora wî ziaret kirin. Polîsan dora goristanê girtin û nehiştin ku ji bili rîeveberen HADEP'a Amedê kes biçe ser gora Vedat Aydin. Her wiha li Bahçelievler û Gazi Osman Paşa Stenbolê û li Tarsusê jî endamên HADEP'ê ji bo bîrânîna Vedat Aydin hin çalakî li dar xistin.

# Edî ‘Maho Axa’ jî dixwaze bi kurdî bipeyive

Diviyabû ji berê ve me di filmên xwe de kurdî bi kar bianiya û li gorî rolan, kurd bi kurdî bipeyiviyana heta vêga pêşveçûneke mezin wê çêbûya û iro li ser zimanê kurdî belkî qiyamet jî ranekirana.

**S**ener Şen; ew hunermendekî wisan e ku ji 7 salî heta 70 saflî insan gelek jê hez dikin. Dema ku insan bizaribin ku filme Şener Şen di televizyonê de heye, malbat tevde li ber televizyonê rûdinin û filmê wî temaşe dikin.


Esas van rojan hîc ne di bîra min de bû ku ez li ser wî binivîsim. Heke wisa be, vêga ew cîma bû mijara vê nivîsê hûnê bibêjin.

Çarşema dawî ya meha pûşperê me hev li Stenbolê li Navenda Çanda Mezopotamyayê nas kir. Belê ew hatîbû NÇM'ê, hem jî ji bo ku kurmanciya hin diyalogan hîn bibe û di filmê xwe yê dawîn “Eşkiya” de bi kar bîne (destpêka meha tîrmehê, dest bi kişandina vî filmî kirin).

## “Em bi kurdî, vî welatî parce nakin!”

Dema min jê re got: “Mamoste êdî serê we jî wê bi kurdî re bikeve bella-yê”, wî jî got: “Eger ji ber axaftina di vî filmî de jî ku tiştek wê bibe, bila bibe. Lî heta kengê wisa bidome. Hem di filmê me de pîrejina ku kurdî bipeyive, jixwe tirkî nizane. Dema mirov bi mantikî bifikire, eger em wê pîrejinê bi tirkî bidin xeberdan, wê zehf bêmantikî çêbe û bi axaftina wê pîrejinê jî, em vî welatî parce nakin her hal.”

Vêga hûnê jî bibêjin ku heta iro cîma pîdevîya vî tişti nedîtiye û cîma iro



Şener Şen

dibîne. Wî jî li hemberî pirseke wiha, ev bersiv dida: “Esas ev kêmasiya me ya mezin e. Diviyabû ji berê ve me di filmên xwe de kurdî bi kar bianiya. Yanê di filman de, li gorî rola însanan, kurd kurdî bipeyiviyana heta vêga di vî warî de pêşveçûneke mezin wê çêbûya. Ü iro li ser zimanê kurdî belkî ew qas qiyamet jî ranekirana li vî welatî.”

Gelo mirov ji bo Şener Şen jî dikare bibêje, ew jî ji bo menfaeta xwe, kurdî bi kar tîne? Li gorî min mirov, ji bo hu-

nermendekî wisa, ku xwe bi mirovan bi hunera xwe daye qebûlkerin, nikare vî tişti bibêje. Çunkî ew bi xwe jî vê dibêje:

“Ji bo ku ez xwe bi te bidim hezkîrin, divê pêşî ez hurmetê nişanî te bidim. Yanê, ku tu pêşî hurmetê nişan nedî, tu nayê hezkîrin jî. Ev prensîba min e. Mesela di 1964'an de min li gundekî Mûşê dest bi mamostetiyê kîribû. Nêzîkî du sal û nîv ez li wir mam û gelek tişt ez ji însanên wê derê hîn bûm. Eger min hurmetê nişanî wan nedaya, min ne dikaribû jiyana wan û çanda wan hîn bibim, ne jî, wan jî min hez dikir.”

## Filmê “Eşkiya”

Ez dixwazim hinek jî, ji vî filmî behs bikim.


Senaryoya vî filmî ji aliyê Yavuz Turgul ve hatiye nivîsin û dîsa ji aliyê Turgul ve ev film tê kişandin. Li gorî film, eşkiya Baran demeke dirêj di gitigehê de radizê û piştî ku ji wir derdi keve diçe gundê xwe.

Eşkiya Baran dibîne ku tu kes nemaye li gund, ji xeynî pîrejinekê. Di wê navê de diyalogeke bi kurdî, di navbera Eşkiya û wê pîrejinê de dibore. Ew pîrejin her çiqas ji eşkiya re dibêje neçe jî, lê ew bi ya xwe dike û lê dide diçe û her wiha film dewam dike.

AYNUR BOZKURT

## Armanca kedxwaran û daxwazên dîlêner şer

AHMET BARAÇKILIÇ



Pêşî Mehmet Ağar tamîm der heqê zîndanan de derxistin. Bi dû re Wezîrê Edaletê Şevket Kazan ku bi koalîsyona DYP û RP'ê hate ser kar. Wî jî ew tamîm betal kirin. Di şûna wan de yeke din derxist. Bi wê jî tiştek neguherî. Berxwedan li zîndanan didomin.

Mêtînger ji esîr û dîlan ci dixwazin, armanca rayedarêñ tirk, bi taybetî ya Wezîrê Edaletê ci ye? Bersiva van pirsan diyar e û ji raya giştî re jî eyan e. Bersiva rayedarêñ tirk û pirsgirêkîn gitîyan bi çalakiyêñ birçîbûnê hat dayîn û

tête dayîn jî. Siyaseta wan jî û ya gitîyan jî eşkere ye

Armanca rayedarêñ tirk ci ye? Ji dilên azadiyê ci dixwazin? Yekemîn daxwaza wan ew e ku zîndanan ji cihê tevgerkirinê derxin. Ji derve re nebe alîkar û piştigir. Bêguman berxwedanê zîndanan jî li dijî vê armanca kedxwaran in. Armanca dîlan perwerdekirin, tevgerkirin û afirandina îmkanan e, destxistina mafêñ dîlan û esîran e.

Dema ku gitî van tiştan dixwazin, serkêşen kontrayan jî radîgîhîne ku, zîndanan ji qada têkoşînê derxîne, pêşengên wan koçber bike, xemgîniyê bixe nav wan û serdarêñ wan, di hinek hepsîn taybetî de kom bike.

Li gorî berjewendiyan li dijî hinekan sist, li dijî hinekan jî hişk here ser wan, itîrafkar û xwespêran bike halê xwarin

vexarinê, dilmaniyê çêke û ji pisgirêkîn bingehîn dûr bixînin.

Polîtîkaya kedxwarêñ tirk, li dijî esîr û dîlêñ zîndanan dîrokî ye, bi ya derve girêdahî ye. Parçeyek ji şerê taybetî ye. Serkeftina li zîndanan serkeftina li çiyan e, serkeftina li zîndanan serkeftina siyâsi û dîplomasî ye, bi kurtayî serkeftina li zîndanan serkeftina gelên Kurdistanê ne. Şikeftina berxwedana li zîndanan şikeftina derve ye, şikeftina têkoşînê ye.

Di dîroka têkoşîna rizgariya netewya Kurdistanê de, berxwedanê zîndana û têkoşîna dîlêñ azadiyê bingeh e. Parastina gitîyan, hevkarî û alîkariyek û delameta her dilxwazekî doza aştî û azadiyê ye. Rêkên azadî û serkeftinan di zîndanan de derbas dibin û bi têkoşînê bi cih tên.

# Ji devê kalekî 95 salî malbata Bedirxaniyan

Mîr bêmecal dimîne,  
dîl dikeve. Piştre  
cilêن xwe yên mîrîtiyê  
li xwe dike, tê nav paşayê  
sultan, Hemû hurmetê  
nîşanî wî didin. Mala  
wî jî bi xwe re bar  
dikin, tînin Stenbolê.  
Heft kurê mîr hene,  
li wir dixwînin, mezin  
dibin. Her yekî di  
peywîreke dewletê de  
cihekî bilind didin wan.

**H**ikûmeta sultana diçe ser Cizîra Botan, pêncî leşkerên romî tênu kuştin. Bedirxan Beg diçe ba şewirdarê xwe yê li Şerepiyê, dibêje: "Ka şiretekê li min bike, me pêncî romî kuştine. Wê dîsa ser me de werin." Şewirdarê wî dibêje: "Ez xwes bikim, an nexwes bikim?" Mîr dibêje: "Pêşî xwes bike, paşê nexwes bike." Şewirdar dibêje: "Mîrê min, netirse jî Diyarbekirê heta Botan, ji Botan heta Şengalê tev eşîre te ne. Wê alayeke leşker bişîmin ser me emê berdin wan heta ji Diyarbekirê biborînin."

Mîr dibêje: "İca nexwes bike." Şewirdar dibêje: "Mîrê min wê alayekê bişîmin ser me, emê wan xelas bikin, wê yeke din bişînin ser me. Em nikarin wan xelas bikin, eşîr hema wê teslim bibin. Tê bîmîni bi tenê û tu bi wan nikarî, tuyê baz bidî." Piştî qisekirinê çend rojan yekineyê leşkeran tênu ser Botan, rewş dibe wekî gotina şewirdar ya duyemin. Eşîr hemû xwe ji pişt mîr dikin. Mîr baz dide diçe, Hewrexê, li Hewrexê li serê ciyayekî ji xwe re qesrekê çêdiye. Leşker diçin ser qesra wî, didin ber top û tivingan qatê stûnê qesrekê difiştigîn diçin nav ava Masîro.

## Mala Bedirxan Beg tînin Stenbolê

Mîr bêmecal dimîne, dîl dikeve. Dema dîl dikeve cilê xwe yên fermî yê Mîrîtiyê li xwe dike û tê nav paşayê sultanan. Feramandarê artêşê hemû ji ber radibin, hurmetê didinê. Dibêjin "Tu ji me mezintir i, çima tu revî."

Mala wî bar dikin, bi xwe re tînin Stenbolê. Heft kurê mîr hene, li wir dixwînin, mezin dibin. Her yekî di peywîreke dewletê de cihekî bilind didin



Neviyîn Bedirxan Beg; Kamûran, Sureya û Celadet Bedirxan.

wan.

Kurê Bedirxan Evdilrezaq li ba sultân demê Evdilhemîd cihê xwe distîne. Ev rewş li xweşa Fermandarê artêşê naçe. Sultan Reşad birayê Evdilhemîd fermandarê artêşê Ridwan Beg û çend giregirê din raporekê amade dikin, dibêjin "Bila herkes di timtêla xwe de azad be, bi malbatî karibin herin sînemayê, çarşefa li xwe nekin, wekî din bila baca xaniya, baca dikanan û baca serê lawiran zêdetir bê standin. Dişinjin ji Evdilhemîd re da mor bike û bişîne bajaran da gel vê zagonê bipejirîne." Evdilhemîd dixwîne dide Evdilrezaq dibêje "Tu jî lê binêre." Dema lê temâse dike, dixwîne. Dibêje Evdilhemîd meheneya min û te têra me heye ku em her roj goşt û birincê bixwin. Lê gel xizan e, tiştê ku ew dixwazin nikarin bîdin, radibin raporê dişewitînin diavêjin sergû.

Qasid diçin ba Ridwan beg dibêje: "Ka rapor?", dibêjin "Evdilrezaq şewîtandîye." Hemû ji vê rewşê aciz dibin, dibêjin "Evdilhemîd kurd kirine mezinê me." Ridwan Beg ferman dide dibêje "Herin sih zilamên kurd ên ku hatîne Stenbolê kar, bînin."

Sih zilam didin hev tînin. Dibêje wan: "Hûn hemû bi çiqasî dixebeitin?", dibêjin: "Bi pênc mecidîye", dibêje:

"Yekî cuhî mala wî li Stenbolêye hûnê işev herin wî bikujin, ezê her yekî ji we pênc zêran bidimê, ci tiştê wî yê hêja ji hûnê ji xwe re bibin herin."

## Kuştina Ridwan Beg pergala Bedirxaniyan belav dike

Karkerên kurd vê pêşniyazê dipejirînin. Dibe nîvê şevê, çekan dide wan, zilamê xwe dixe pêşîya wan û mala Evdilrezaq nişanî wan dikin. Hawirdorê mala wî digirin; êrîşê dikin, didin ber guleyan. Evdilrezaq radibe ber pence-rekê, bangî wan dike. Dibêje: "Ez Evdilrezaq im, kurê mîrê Cizîra Baton, ci halê we ye hûn êrîşî mala min dikin. Min tiştê bi we kiriye" Yekî erişkar dengê wî dibihîse, bangî wanên din jî dike, diseokin û tênu li ber deriyê malê dicivin. Evdilrezaq Beg tê ba wan rewş tê fêmkirin.

Bûyer tê sehkîrin (bihîstin). Evdilrezaq naçe daîreyê, Sultan Evdilhemîd qasidan dişîne, dibêje: "Were me bûyer bihîstiye, em zehf xemgîn in lê bila bê vesartin."

Roja sêyemîn diçe, zehf hêrs bûye, dibêje: "Ez derbeyekê li Ridwan Beg nedim hedana min nayê."

Dibe bihar Ridwan Beg diçe Gundaxdimê, teftîşa leşkeran. Evdilrezaq

panzdeh mîrên kurd dicivîne, wan dike heft heft û dibêje: "Dera ku ew tê re here du rê ne. Her komek we wê xwe li ser rîkê veşêre, dema di kê rê de were, wê riya wî bigirin û bikujin, hûn neku-jin ezê we bikujim

Ridwan Beg di paytonê de tê, di nav koma riya ku tê de yekî ku dibêjinê Eh-moyê Mûşî heye, serokê wê komê ye. Ew dest diavêje serê hespê, ji rê derdi-xe. Ridwan Beg dibêje: "Çi ye?", dibêjin: "Emê te bikujin", dibêje: "Wa min neku-jin, ezê bi qasî giraniya xwe zêr bidim we." Ew dibêjin: "Emê te biku-jin, heke em te neku-jin jî emê bênu kuştin." Ridwan Beg dikujin û diçin xwe vedîşerîn. Bûyer li nav gel belav dibe, dibêjin: "Kurdan Ridwan Beg kuştine. Evdilhemîd kurd kirine mezinê me."

Piştî vê bûyerê Evdilrezaq xwe çend roja vedîşerê, paşê derbasî nav ûris di-be. Giregirê Osmaniyan yê demê têna ba hev; malbata wî ya mayî, birayê wî dişînin dadgehê ji bo darizandinê. Bîrakeyî Ridwan Beg û yekî Evdilrezaq di dadgehê de hev didin ber damançeya her du tênu kuştin.

Mala Bedirxaniya bela dibin. Paşayê demê têna ba hev Evdilhemîd dibin bajarê Selanîkê, diavêjin girtgehê.

BERHEVKAR:  
O. HESIN



● 7.7.1991: Vedat Aydin ji alyê kontrayan ve hate şehîdkirin. Roja 5'ê tîrmeha 1991'an polisan bi şev ew ji mala wî birin. Pişti du rojan cendekê wî li ser riya Elezîzê û Amedê hate dîlin.

● 10.7.1991: Ji bo naştina Vedat Aydin li Amedê 100 hezar kes berhev bû. Hêzên dewletê meşvan gulebaran kîrîn. Di gulebaranê de 11 kes jî hatin kuştin, bi sedan kes jî birîndar bûn.

● 13.7.1989: Sekreterê Gişî yê PDK'ya franê Dr. Abdurehman Qasimlo li Viyanaya Avusturyayê tevî çend hevalen xwe ketin kemîna ajanen Iranê û hate şehîdkirin.

● 14.7.1989: Şoreşa burjuva ya Fransayê çêbû.

● 14.7.1982: Li girtîgeha Amedê di rojya mirinê de M. Hayri Durmuş, Kemal Pir, Akif Yılmaz, Ali Çiçek bûn şehîdê berxwedanê.

● 16 Tîrmeh 10 Kewçer 1980: Serhildana Oramarê dest pê kir.

● 17 Tîrmeh 1967, 3 Kewçer 1969: Ji alyê Partiya Kedîkarîn Tîrkiyeyê (TIP) ve meşen rojhîlatê hatin lidarxistin.

● 22.7.1943: Li Newala Sefoya Bégira Wanê 33 gundiyan kurd bi destê leşkeran hatin kuştin.

● 24.7.1923: Peymana Lozanê hate morkirin, bi vê peymanê Kurdistan bûn çar parce.

## AWIR

# Şehîd nemir in

**L**i ser her çar parçeyê Kurdistanê bi dehan bîrînê ku na-kewin hene. Bi kuştina Dr. Abdurahman Qasimlo bi gişti dîlê gelê Kurdistanê û bi taybetî jî di dilê gelê meyî li rojhîlatê Kurdistanê de bîrîneke bi rengî vebû. Dewletên mîtinger ji bo kurdan her dem politikayê nû afirandin. Bi kuştina serokan tevgeren azadiyê nikaribûne bifetisînin, dest bi aśimîlas-yonê kirin. Rejîma Iranê ji bo kurdan digot: "Azeriyên çiyayî" wekî li Tîrkiyeyê jî digotin "Tirkên çiyayî" van gotin û kirinan pere nekirin, dest bi qetliamân girseyî kirin û her tim jî bo kurdan ev hevok bi kar anîne "Kurdîn herî baş yên mirî yne".

Li Kurdistana Iranê di navbera 40 salî de pêncî hezâr sivîl û çar hezar û pênsed pêşmerge ji bo ku daxwaza mafêñ însanî kirin, hatin kuştin. Sekreterê Gişti yê Partiya Demokrat Kurdistanâ Iranê Dr. Abdurrahman Qasimlo roja 13 tîrmeha 1989'an li paytexta Avusturya-Viyanayê ji alyê ajanen Iranê ve hate qetlikirin. Dr. Qasimlo ji bo civîneke di navbera PDK'ê û tevgera İslâmî ya İran-

nê de çûbû Viyanayê, lê bi kemîneke xayîn ew û çend hevalen wî hatine şehîdkirin.

Dr. Qasimlo di 22'ê berfanbara 1930'ı de li bajarê Urmîyê hate dînyayê, perwerdehiya xwe ya amadehî (fîseyî) li Tehranê qedand. Perwerdehiya Zanîngehê jî berê pêşin li Parîsê, pişt re li Pragê di sala 1952'an de Fakulteya

Zanistîn Civakî û Polîtikayê qedand. Di navbera salên 1960-1970'an de li Pragê di eynî zanîngehê de asîstanî û doçentiyê dike. Pişt re vedigere Iraqê di wezaretiya plankirînê de birêveberiyê dike. Dr. Qasimlo careke din vedigere Pragê di Zanîngeha Zanistîya Birêveberî û Aborîyê de profesoriyê dike. Di salên 1976-1978'an de jî li Parîsê di Zanîngeha Sorbonê de Profesoriyê dike.

Dr. Qasimlo di sala 1972'an de di konferasa 3'yemîn a Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iranê de wekî Sekreterê Gişti yê Partîyê tê hilbijartin.


Dr. Qasimlo berî şoreşa Iranê di sala 1978'an de vedigere Iranê. Di partiyê de bi mebesta xurtkirina rîexistin û tevgerê, dest bi xebatê dike. Bi wê xebata wî ve rejîma Xumeynî tengazer dike, ji ber vê yekê jî ajanen Iranê ew kuştin. Dr. Qasimlo pirtûkek li ser rîexistina xebatên ku wî dane pêsiya xwe û pirsgirêkên partiyê bi navê "Di şoreşa azadiyê de cil sal" nîvîsandibû û çend berhemên wî yên din jî li ser rewşa siyasiya kurdan hene. Dr. Qasimlo zimanê îngilizî, fransizî, rûsî, farsiî, çekî, tirkî û erekî dizanibû.

Dewleta Iranê jî ji hevalben-dîn xwe yê mîtinger Tîrkiyê û Iraqê li paş nema. Simkoyê Şîqaqî û Îhsan Nûrî paşa bi destê SAVAK'ê dan kuştin, pişt re jî li Meydana Çarçirayê jî Qazî Mihemed û hevalen wî bi dar xist û pişt re jî Dr. Qasimlo... Lî rejîma Shah Îsmail û Xumeynî bi qetliaman û bi aśimîlas-yonan nikaribûn rî li ber tevgera azadiyê bigirin.

M. DAREBÎ

## ÇAVDÊRÎ

MIRHEM YİĞİT



## Rewşa Tîrkiyeyê

**M**eqlala me bila iro li ser Tîrkiyeyê be. Hem li ser Tîrkiyeyê be û hem jî bi gotin û sıfatên rojnameyanen tîrk û siyasiyên deshelatdar be. Rast e, rojnamevaniya tîrk ne rastgo ye. Telaqreş e, mizawur û derewîn e, fanatik e, ji serxeçüyî û qulubî ye. Rojnamevaniyek terefir e, li heq û neheq napirse û ji leşkeran leşkertir, ji polisan jî hê polistir e.

Belê rastî ew çendî bûye mîna rojê, rim ew çendî di kewaran de hew hiltê, bêexlaqî ew çendî tîr û tarî bûye ku rojnamegeriya tîrk jî hin tiştan dibêje.

Hoste û koneyen veşartina rastiyê, şabaşanen qesabî û xwînrejiyê, handar û navtêderen perçiqandina azadiyê, daholvan û zurnevanen şerî qirêj, qelemîn helî sadist û militârist mîna Emin Çölaşan û Ertugrul Karakollukçu jî êdî firtefîta wan e di cihê xwe de, qûna wan erdê nagire û pê dihesin Tîrkiyê ber bi ku de dice û çawa serberjîr bûye: "Bobelat û waweylêya Tîrkiyê ketîye nav bi lez mezîn dibe. Xezbek herâli Tîrkiyeyê radipêce. Krîzek li pey ya din tê û yet ya din kûrtir dike."

"Bûye zibilxane Tîrkiyê, dibe ting û sergoyeki ji gemar û lewitê.

Şikagoya salên 1920'an. Tu li kîjan rojnameyê dinîrî giş behsa diziyê, delewêre û şêlandinê dikan. Her der bûye mafya."

"Min ji ber mafya qumarê hev kir der û ji berpirsiyartiya Emniyeta Stenbole isîfa xwe da" dibeje Orhan Taşanlar

Tîrkiyê bûye bîhuşa pereyên reş û şerî nav siyasiyan li ser pereyên reşê". Ev ji gotina alîkarê Müsteşarê Xezîneyê Nevzat Saygilioğlu ye.

Rojnamevan ji bêşerefiyê û nedirustiyê gazinan dikan li şerefê digerin;"

Şeref tu li ku yî?" navê meqlayeke Bekir Coşkun e.

Nivişt û berbejnên "Mutabekata Neteweyî" jî hew kér dikan. "Kes li kesî guhdarî nake, ne serokên partiyen koalisyonê û ne jî serokwezîr û wezîr li hev dikan."

"Bîrêvebir û serokên partiyen siyâsî ewil Mesut Yılmaz û Tansu Çiller û pişt re yê mayî her yekî rahiştine melhêbekê û kaya hev didîrin. Ci tê ber devê wan ji hev re dibêjin. "Yê nîr ji ya mî re" te Tîrkiyê kiriye tîmarxane, rewşa me wiha here, ne Tao û ne Mao dê karibe me rizgar bike" û ya mî ji yê nîr re: "Tu lewîtî û pîs î, ha tu û ha herî ferqa we ji hev tune ye." dibêjin.

"Baweriya bi siyasetê, bi siyasetmedaran û bi Meclîse mîna berfa tu avê lê siwar bikî dihele. Siyasetmedar baweriya bi siyasetê bombebaran dikan. "Gelo bîrêvebirê me zanîn bê xelk li çayxanan, li xwaringe û meyxanan ji bo wan ci dibêje? Qey ruwê wan naşî" dibêje û dipirse Ertugrul Karakullukçu: "Gelo hêvi heye, rojekê siyasiyên me hişê xwe bidin serê xwe û wijdanê wan hişyar bibe?"

Yê haho hahoya wî ye û xwîliyê bi serê xwe dadike ne bi tenê E. Karakullukçu ye. E. Çölaşan jî porê xwe dikşîne. Ew jî behsa "xayıntiyê, sersarî û nekirkîriya siyasiyan" dike û didomîne: "Welat ji destan dice. Em di nav xelk û alemê de bûne sêwiyên bê dê û bê bav. Em hew karin meaşen personelên balyozxaneyen xwe bidin."

Edî tîrk û peyvîn mîna "Xweziya min bi dilê wî kesî ku tîrk e.", "Hilkişe tîrk hîlkiye ji bo te sînorê bilindbûnê tune ye.", "Jî Adriyatîkê heta bi sedê Cinê tîrk e." û "Tîrkek berambarê dînyayê ye" û hwd. Li sük û bazarê hew heq dikan, "Ewrûpiyek ji tirkekî 15 caran berhemdarît û bi kalîtitir e" li gora hesabekî Çetîn Altan.

"Sûcda kî ye?" "Sûcda û tawanbar gelê tîrk e. Gelê tîrk e ji ber ku van siyasiyan li ser serê xwe qebûl dike, dibêjin Tufan Turanç û Yavuz Gökmen, Cem Boyner jî ne dûrî vê fikrê ne".

Qula ew tê re dîziyê dike yek e. Ew reqen nav kevzekê, biracêwiyên hev, teyrê dibirak, sêbirak û çendbirak in. Û tiştekî din: Ne dirêşik, belê gîsin li ruwê wan dîcerixin û yek ji yê din rûşütâtir û bêşermîtir e.

Herîwa besta ava wan û istîqameta wan yek e. Gotina dawî: Mesele, ne mesela çend serok û bîrêvebiran û çend kesen burokrat û xwedîmeqam e. Mesele kûrtir e, firehtir e. Mesele, mesela rejîm ye, mesela rejîm e, mesala sistêmê ye û ev jî pir girêdayî mesela gelê kurd e.



# Huner bi xwe pirsek e divê

**Bi parçebûna welatê kurdan, destê mirovên kurd ji hev qut bû. Vê yekê bandoreke mezin li ser giyan û ramanên kurdan jî kir. Lê tevgera azadiyê ev sînor bêfonksiyon kirin. Niha mirovên kurd hev û din baştir dinasin. Rojnameya Azadiya Welat jî wekî weşaneke kurdistanî cih dide rûdan û qewimînên li çarmedorê welêt. Nûnerê me HELÎM YÜSIV bi hunermendekî başûrê biçük Ehmed Qilêç re hevpeyvîneke taybet pêk anî.**

**H**uner û zaroktî du beteben ku bi sed pêwendî bi hev re téne girêdan in, çi têkilî di ve hêlê de li cem te derketin?

● Tê bîra min, min pir li dora xwe dinêrî, riyêngî çiyê, şuna mar, gelek carî min dida dû. Sirûsta çiya ez kişandim, dirêjiya deştê ez kişandim. Erê zaroktî bingeh e, nemaze dengnekirina deşt û çiyan û girêdana bi lîstikên zarakan re, ew hespêngî textikî yên me çedikirin û em li wan siwar dibûn, gelekî van tiştan bala min dikişand. Zaroktiya min belavbûyî bû di nav gund û bajêr de; gund azadî bû, bajêr (Heleb) jî ez dihiştîm bi tenê. Ez biçük bûm dema birayê min û mezin pêñûs û pelên spî dabûn dest min û

xwest ku her yek ji me xuşa xwe resim bike. Resmê herî xweşik ê min derket. Xweşiya vî tişti bi min re mezin bû, resim bûbû mîna nan û avê. Têbîrên min tevde li ser gund in û bajar jî di bîra min de valahî ye. Gelek carî ez bi şaşî bi hevaline xwe yî ereb re bi kurdî dipeyivîm, ez û wan bi hev re dikenîyan, şivantî, cot, werzê zeytûn û genim û ceh, min tevde bi destê xwe dikir.

*Bi şînbûn û gîhîştina laş û canê hunermend re gelek tişten balkes têne holê, tu li ber ci tişti ji van radiwestiyayî?*

● Mirovahî, mirov mîna tiştekî nexuyayî û tevlihev bû li cem min. Min dixwest ku her tiş têkeve riya têgîhîştina rewşa mirov û çawatiya çêbûna laş û canê wî, hatin û çûna

wî ji dînyayê. Ez li kilîtine zanistî digeriyam, ta ku ez van tiştan kêf, xem, girî.... têbigihîjim, gelo çawa ezê têkevîm hinavê mirovîkî, min di tabloyê xwe de xwe resim dikir. Min dixwest ez xwe fêm bikim. Dû re ez zanibim bê ci li hawîrdora min dibe. Dibe jî ku mirov mîna pîvazê, her ku qetekî wî radibe qetekî din derdikeve, min jî ji xwe nêzîktir nedît ku ez hinavê xwe bidim ber roniyê? Erê, xweşyeke bêşînor e dema mirov tiştin nû di xwe de dibîne.

*Tabloya te di gelek qonaxan re derbas bû, bû klasîk û dûv re govennda rengan bi awayekî "Tecrîdi" dest pê kir û gelek neqş û sembolên kevn di tabloyê te de cih girtin.*

● Di vê qanoxê de ji tecrîdê bêhtir ez nêzîkî sembolîzmê bûm. Sembol jî kurtahiya rewşa ahengî ya mirov e û ev neqsên ku hene jî bi destêni mirovan hatine sazkirin. Li ber van pirsgirêkan dil radiwestiya; hebûn, gerdûn Xwedê, stêrk, ezman, van pîrsan ez geleki êsandim, tiş nema û min nekir ji bo ku ez nêzîkî ramaneke xuyanî bibim. Heta ku ez li vê çareyê rast hatim, ew jî di hundirê min de bû, divê ez bi renjan êrîşan bibim ser hinavê xwe da ku hinekî ev toz ji ser çavên min bête hilanîn.

*Niha bi dû van êrîşan de gelo tu bersiv li cem te çêbûne yan jî pirs zêdetir dibin?*

● Çiqasî pirs pirtir dibin wisa jî tu nirxekî didî hebûna xwe û dema tu karibî bipirsî tu karî bibêjî ku tu heyî. Ez bi huner li hemberî hemû azmûnan radiwestiyam, huner çeka min e di vê hebûnê de û ew riya yekemîn e ku dikare berê me bide xakeke firehtir û jiyanke xweştir.

*Hundirê tabloyê bi xwe di wê demê de çawa bû, paçikê spî te çawa didît dema tu li ber radiwestiyayî?*


● Tablo li cem min rûmeta wê heye, tim wêneyek di bala min de ye; ramanek serê min dişêne û nahêle ez razim. Carinan ez reng û wêneyan çedikim, ne wekî yên ez tê de diramiyam in. Ez bê hest û ji nişkave li ber paçikê spî radiwestim û di kîlîka çêkirina resmê de carina rewşa hunermend tev de li hev




Ehmed

Sala 1964'an li gundê Maratê li med a hunerî li Helebê sala 1985'a hunermendê Koma "Sor x Zer" (resmê de sala 1975'an de qezendî beşdar bûye ev in: Pêşangeha li Zangîşangeha hunermendê Efrînê li Zangîşha li salona Ekkad li Helebê di sala (sir Husêñ); pêşangeha li Salona Tişîrî hunermendan re; pêşengeha 'Buhâ' hin hevalên xwe li Salona Elecewîşînern mendê Sor X Zer pêşangehebo bûn, niha Nihad Gulê, Cîmî

dikeve. Tablo bi xwe pirsgirêk e û divê tu çareyekê jê re bibînî. Mirov problemê çedîke û carinan jî dibe dilê vê problemê û li çareyekê



# unermend jê re bibe bersiv




## ç kî ye?

dayikê bû. Navçeya Fethî Mihe-  
a kir. Endamek e ji damezirînerên  
Qalata Kovara Usama ya zarokan di  
çşangehên ku wî vekirine, yan jî  
Helebê di sala 1987'an de; pê-  
gelebê di sala 1990'ı de; pêşange-  
de digel hunermendekî erek (Na-  
relebê di sala 1992'an de bi gelek  
debê' di sala 1993'yan de û tevî  
ala 1995'an de bi navê Koma Hu-  
om di destpêkê de sê hunermend  
çylûnî, Ehmed Qilêç in.

digere; mîna lîstikeke geran e ev  
rewş, xweşî jî eynî di vê pirgalê de  
ye.

Ku tu pirsine spehî bînî zimên û



tu bi xwe bersivine çak û xweşik jê  
re deynî huner xweşyeke taybet e.

*Ev guhertinê tûj ku firçeya te  
dabiûna ber pêlén xwe ci bi dû de  
hebû, ango ci cûdayeti di navbera  
şeweya te ya berê û ya niha de  
heye?*

● Ev guhertin ne guhertinine  
bingehîn in, ji ber ku mirovayetî  
stûna her du şeweya ye. Min xwest  
ez hemû hêzan têxim azmûnekê ku  
çawa bi xêzek reng mirov dikare  
gelek raman û nerînê hunerî bêje, û  
bêje ev jî ez im. Carinan gulek bi  
çûcik di nav gulistaneke mezin de, te  
dikişîne, tu nizanî çima. Ez zivistanî  
li ser cilekî rûniştibûm, ji nişka ve  
min dît ku kûraniyek heye bi dû van  
neqsan de ku cil pê xemilibûn. Di  
nêrîna min de şeweya "Tecrid"ê  
koka wê rojhilatî ye. Rojhilatiyan  
berî her kesî reng bi tazîbûna xwe li  
ser paçikan raxistin. Ez bi şeweyekê  
kar dikim ku dû re ji akamên hunerê  
Rojava ez dixwazim destê xwe deyn-  
im ser dilê rojhilat, heta bi wêneyên  
li ser dîwarên şikeftên kevin, tev de  
gotinin mezin bi xêzin biçük dibêjin.  
Pirsa mezin ew e, ne ku tu çivîkekî  
ku dikeve çêkî, lê ku tu rewşa ve  
ketinê bidî ber çav; rojhilatî jî ji roja  
roj ve li vê pirse xwedî derketin û bi  
huner xwe xwestin bersivên xweşik  
bidin.

*Ez dibînim tim kûraniyeyeke felsefî  
tu didî babeten, lê dema ku ez  
dibêjim ku mirov, dirûv, laş, rû ..  
winda bibin di tabloyen te de. Ci  
nérîneke teknîki bi dû vê rewşê de  
heye?*

● Problem nema di mirov bi xwe  
de ye. Nirxa mirov ne di rû û  
dirûvên wî de ye, lê di kar û  
berhemên wî de ye, ev reng û neqşen  
tabloya nû jî ji berhemên mirov in;  
hinav û hestêne wî ne. Cotkar nirxa  
wî ne di wî bi xwe de ye lê di karê  
wî de ye. Min xwest ez firehiyekê  
bidim vê ramanê, tu nikarî bi zimanê  
helbestvanekî bi şivanekî re biçeyivî,  
ev ziman ev şewe li gor rewşê ye,  
ramanine nû teknîkine nû tînin mey-  
danê, lê problem di wir de ye ku ev  
pirsên me tev de kevn in.

Hunermend di kevtirîn demê de  
pirsine girîngit anîn zimên. Ji  
hunermendê hemdem bêtir  
wêneyên li ser dîwarên şikeftên kevin  
ku mirov bi tîr û kevan lawiran diku-  
je ne kêmî tabloyeke Picasso ye ku  
bombebarandinê tîne ber çav, mîna

tabloya "Guernica."

*Di hunerê de, navine kurdî hêja û  
bihêz derketin û rê gelek vekirin di  
ví warî de, heta ku pirsa taybetiya  
hunera kurdî, tabloya kurdî zêdeyi  
carekê hatiye zimên?*

● Erê, berî me, hinek hunermend  
derketin û tabloyen girîng dan,  
desten xwe danîn ser çirayen vêketî  
di jiyana me de, dilsoz bûn ji surîta  
xwe re, cîhaneke kurdî eşkere hate  
holê, rengên eşkere hatin ber çav;  
rengên ku bi ronahiyê ve girêdayî  
ne, gelek carî tiştin biçük û windayî  
hene ku nexuyayîne, lê van huner-  
mendê kevn çavê me li ser xak û  
rengên me vekirin.

Beşar Isa dema li ser kesen  
gundi rawestiya bi germiyekê ew di  
tabloyen xwe de binirx kirin. Malva  
(Omar Hemdî) bi tegandina rengan  
gelek tabloyen hêja pêşkêsi cihanê  
kirin, wisa jî huner bêhtir mirov dajo  
ber bi rastiya wî. Girîng e ku huner-  
mend rast be bi xwe re û hebûna  
xwe bi cih bîne. Teknik divê bikeve  
xizmeta hinav û hestêne min û ne ji  
bo ku bibe cil û ji bin lingê tu kesi  
bê kişandin.

**Min dixwest ku her  
tiştî têkeve riya têgihiştina  
rewşa mirov û çawatiya  
çêbûna laş û canê wî,  
hatin û çûna wî ji dinyayê.  
Ez li kilîtine zanistî  
digeriyam, ta ku ez  
van tiştan kîf, xem,  
girî... têbigihîjim, gelo  
çawa ezê têkevîm hinavê  
mirovekî ku min di tabloyen  
xwe de xwe resim dikir.  
Dû re ez zanibim bê ci li  
hawîrdora min dibe...  
Erê, xweşyeke bêşînor e  
dema mirov tiştin  
nû di xwe de dibîne.**



# Bila kurdî bi alfabeaya

## Braile jî bê nivîsandin

Li Îzmîrê valahiyek hebû di vî warî de. Ji ber vê yekê TAYD-DER ava bû. Armanca me ev e ku, malbatênu omidiyên (lêzim) wan di girtîgehan de ne, em dixwazin alîkarî û piştgiriya wan bikin, wan bînin ba hev û bikin yek. Neheqîya ku li girtî û cezaxwaran dibe, wê komeleya me bidezanîn û tewreke gelempêrî li dijî neheqîyan pêk bîne.

**K**omeleyek bi navê TAYD-DER'ê di 25'ê adarê 1996'an de li Îzmîrê vebû. Ji bo serokatiya Tutuklu ve Hükümlü Aileleri-Yakınları Yardımlaşma ve Dayışma Derneği (Komeleya Alîkarî û Piştgiriya bi Malbatên Girtî û Cezaçwaran re) Parêzer Ahmet Önerge peyvir hilda. Ahmet Öner ji bînahiyê bêpar e (çavên wî nabînin) lê ji bo ronakiya bir û baweriyê ev yek tu car nebûye asteng.

Li ser navê Rojnameya Azadiya Welat hevalê me Ferec Kurêşivan hevpeyvînek bi Ahmet Önerge re pêk anî û komeleya TAYD-DER'ê bi gel dide nasîn.

\*\*\*

*Pêşî hûn kî ne, em dixwazin we bi xwendevanê xwe bidin nasîn?*

– Ez ji Bîlsîme. Di sala 1961'an de ji dayika xwe bûme. Hîn ez yek salî bûm, ji ber nexweşiyê min bînahiya çavên xwe winda kir. Min medrese xwend li Kurîstanê. Heta 20 salî min dibistan nexwend; dibistana sereta, navîn û amadeyî min ji derve kuta kirin.

Di dema sixurmeya (darbe) 12'ê rezberê (1980) de ez hatim girtin û piştî 21 rojan ez hatim berdan û vê rojê sün de min bîryar da ku ez bibime parêzer.

Piştî e ez hatim Îzmîrê; di 1983'an de ez ketim taqîyên (sinav) zanîngehê. Cara yekem min taqî kesiband (qezencîkir) û ketim fakûlteya dadiyê. Min di 1988'an de dibistan qedand û weke parêzer bi serbestî xebitîm.

Min di gelek komeleyan de kargerî kir.

Wekî Komela Parastina Kesêna Bêbînahî (Görmenlerî Koruma Derneği) Min di vê de dubendî dit û ez bûm dijberê vî karî. Di 1988'an de Komeleya Kesêna Bêbînahî (Körler Der.) dîsa me vekir û ez karger bûm. Paşê li Enqereyê me Komeleya Kesêna Bêbînahî yên Nûjen (Çağdaş Görmenler Der.) me vekir û 2 salan serokatiya wê min kir. Par jî li Herêma Egeyê Komeleya Ji bo Alîkarî û Piştgiriya Çanda Bilîsî min bi xwe avakariya wê kir. Di dawiyê de jî, ji bo malbatênu girtî û cezaxwaran alîkarî û piştgiri pêwestî û gi-ring e. Ji ber vê yekê me TAYD-DER vekir.

*Aliyekî we ya lêkolineriyê heye, gelo, qet bi çand û zimanê kurdî pêwendiyêne we hene?*

– Min li ser zimanênu Rojhilata Navîn lêkolîn kir û ez hînî zimanê tîrkî bûm û kurdî jî zimanê min ê zikmakî ye. Lî di nava van zimanîn de li gorî yên din, hindîkî bi kurdî dizanim. Kurdî jî bi taybetî li medresyan hîn bûm, wê gavê ez feqe bûm. Bi riya axaftin û guftûgoyan ez hînî kurdî bûm, lê ez niha nikarim



Serokê TAYD-DER'ê Parêzer Ahmet Önerge

bibêjim bi kurdî pir baş dizanim.

*Ji bo ku kesen weki we hînî zimanê kurdî bibin, ci pêşniyazen we hene?*

– Bila zimanê kurdî jî bi alfabeaya Braile bê nivîsandin. Braile kesekî amerîkî ye di sala 1860'î de alfabeypeke ji bo koran afirandiye. Kaxizê dinepixînîn û tip û hejmar ava dibe. Em destê xwe didinê û hînî xwendina wê dîbin. Niha ez Rojnameya Azadiya Welat nas dikim û pir jî kîfa min jê re tê. Bes ne kesen li dora min baş dizanîn bixwînîn û ne jî dema wan heye ku bixwînîn û ez jî guhdar bikim. Ji ber van astengan bi zanyarî hêviyê min tune ye ku fêrî kurdî bibim.

*Niha em vegeerin ser TAYD-DER'ê. Çima ev komele û ji ber ci pêdiviyan we ew ava kir?*

– Tê zanîn ku serekî polîsan bû wezîrî dadiyê. Ev ne tiştek e ku bi xwe çêbû. Ev kes terfi kir da ku dîlîn siyasi bîne rê.

Ev kes Mehmet Ağar e. Ağar kadroyê berî xwe ji kar dûr xistin û di dewsa wan de zilamîn xwe bi cih kirin. Bi amadekariyeke mezin û dorfîreh bingeha êrişen bi rîk û pêk datînin. Niha bi navê 'Talîmata 6'ê Gulânî' talîmatek derxistiye. Em vê talîmatê ji dozgeriyê dixwazin li ser navê baroyê lê nadin me. Armanca ev e ku li hemberî wan hêzeke raya gişî çênebe ku ew êrişen xwe, bi nehîn û hêsanî pêk bînin.

Di nava raya gişî de tê gotin ku wezareta dadiyê bixwaze wê bêyî bîryara dadgehê girtiyêne li Îzmîrê bibe Afyonê têxe girtîgehê. Ev tê ci wateyê hûn zanîn. Yek jê malbatâ wî nikarê biçe serdana wî. Ji aliye pereyan ve mesref pir çêdibe. Ya din parêzer nikare bervedêre (mûvekkil) xwe bi zagonî biparêze. Yanê ji malbatan mafê ziaretê distine û ji me jî (parêzeran) mafê parêziya bervedêr distine, ev Talîmata 6'ê Gu-

lan e. Di encamê de bervedêr bi tenê dimîne. Dibe ku tişten hin xeter hebin, em nizanîn ji ber ku metna ta-lîmatê nadin me.

*Armanca TAYD-DER'ê ci ye?*

– Li Îzmîrê valahiyek hebû di vî warî de. Ji ber vê yekê TAYD-DER ava bû. Armanca me ev e: Malbatênu omidiyên (lêzim) wan di girtîgehan de ne, em dixwazin alîkarî û piştgiriya wan bikin, wan bînin ba hev û bikin yek. Neheqîya ku li girtî û cezaxwaran dibe, wê komeleya me bidezanîn û tewreke gelempêrî li dijî neheqîyan pêk bîne.

Malbatênu hewcedariya alîkariya bûjenî û diravî hebe daxwaziya alîkariyê jî di nava armancê komeleya me de cih digire.

Em dixwazin ku rewşa girtîgehê T.C' ê bibe weki yên navneteweyî. Bi vê armancê ve girêdayî Komîsyona Girtîgehan, Komîsyona Dadî û Komîsyona Têkiliyê bi Gel re wê bê damezirandin û xebatênu xwe bikin.

*Hêviyêne we ji TAYD-DER'ê heye?*

– TAYD-DER tu cudayetiyê naxe nava girtî û cezaxwaran. Cudayetiyê weki nîjadî, zayendî, nîfrîna rîzânî ji bo TAYD-DER'ê girîng nîn e. Ev komeleye ne ya malbatênu girtî û cezaxwaran rîzân e, bi tenê. Em xwe nêzîkî malbatênu kesen ku ji sûcîn adî te-wanbar bûne û ceza xwarine jî dîkin. Yanê komeleya me wê destê xwe dirêjî hemû malbatênu girtiyêne ku rastî neheqîyê têne, bike. Ji ber vê yekê em bang li hemû malbatênu girtî û cezaxwaran dîkin: Werin li TAYD-DER'ê xwedî derkevin, bibin endamê wê; hevûdu nas bikin, bi hev re bimeşin û bi hev re li zarokên xwe xwedî derkevin û dengen xwe bilind bikin.



Li Navenda Çanda Mezopotamyaya Stenbolê şaxê Beyoğuliyê vê heftiyê ev çalakî hene:

● **21.7.1996 Yekşem:** Sohbet li ser helbestê, gotinbêj M. Zahir Kayan, mijar: Di prizma şîrê de rastî, saet: 14.00, Konsera Koma Agirê Jîyanê, saet: 18.00

● **24.7.1996 Çarşem:** Semînera Cigirê Serokê Komeleya Mafêni Mirovan (IHD) û Serokê IHD'ya Amedê Mahmut Şakar, mijar: Li herêmê perçiqandina mafêni mirovan, saet: 18.00

● **26.7.1996 În:** Ji NÇM'ê beşa Hunerên Dîlbarî filmê Kuhletwanpe, derhêner B. Brecht, saet: 18.00

● **27.7.1996 Şemî:** Ji komên muzîkê yên NÇM'ê konsera Koma Ciya saet: 15.00, Şanoya Raperîn lîstîka Öç, nivîskar Orhan Asena, saet: 18.00

Li NÇM'ya İzmîrê jî vê heftiyê ev çalakî hene.

● **21.7.1996 Yekşem:** Konsera Koma Agirê Zerdeş, saet: 20.00

● **25.7.1996 Pêncem:** Dîlan ji komên NÇM'ê Koma Kendal lîstîka 'Welat û Jîyan', saet: 19.00

● **26.7.1996 În:** Şano ji lîstîkvanê 'Do' lîstîka Sığıntılar, saet: 19.00

● **27.7.1996 Şemî:** Ji NÇM'ya Stenbolê konsera Hozan Delîl

## RÜDAN

# Êdî kurd jî dîbin xwedan ansîklopedî

**Ansîklopediya Kurdistanê wê di 5 salan de bi du  
zaravayênd kurdî û bi rûsî, îngilîzî bê amadekirin**

**C**ivîna yekemîn a Komîteya Ansîklopediya Pûxte (concîce) a Kurdistanê di navbera 1-3'ye tîrmehê de li Bruksele kom bû. Nêzîkî 30 zanyarênd kurd û dostênd kurdan besdarî vê kombûnê bûn.

Kombûnê bi axaftina Serokê Institutûya Kurdî ya ji bo Zanist û Lêkolînê Îsmet Şerîf Wanlî vebû. Birêz Wanlî ji aliye teorîk û pratîk ve çerçoveya vî karê giranbuha, diyar kir. Her wiha wî bal kişand ser astengî û girîftariyênd li ber kesen ku dikevin bin karekî bi vî rengî û di gel vê wî ji bo pêkanîna kar hin pêşniyazên xwe jî anîn zimên.

Li dû Şerîf Wanlî, ji Institutûya Rojhîlatnasiyê ya Akademiya Zanyarî ya Rûsî Profesor Lazariev di warê birêxistin û pergaldayîna kar de hin hin şîretên bi-jûn kirin. Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya


jî bi axaftinekê bêhempabûna karê ansîklopediyê bi bîr xist û da zanîn ku PKDW ji bo her cure alîkariya ku jê bê, amade ye. Civînê sê rojan dom kir û bi gelek biryareñ girîng dawî lê hat.

Li gorî biryareñ ku ji kombûna komîteyê derketine wê bi navê Ansîklopediya Pûxte ya Kurdistanê (Concise Encyclopedia of Kurdistan (CEK) ansîklopediyeyeke berfireh li ser kurd û Kurdistanê bê amadekirin. Ev ansîklopedî bi awayekî akademîk li ser hemû mijarîn têkildarî kurd û Kurdistanê, lê zêdetir wê li ser mijarîn wekî, erdnîgarî, dîrok û çandê be; Tê gotin ku tevî du zaravayênd kurdî (kurmanciya jêrîn û kurmanciya jorîn), wê ansîklopedî bi zimanê rûsî û îngilîzî were amadekirin. Her wiha ji bo kurmanciya jorîn tîpêñ latînî, lê ji bo kurmanciya jêrîn hem tîpêñ latînî hem jî tîpêñ erebî têñ bikaranîn.

Ansîklopedî bi besdarî û alîkariya gelek zanyarênd kurd û kurdnas û rojhîlatnas tê amade kirin. Ji bo ansîklopedî Lijneya Edîtoran hate hilbijartîn; Edîtorê Giştî İsmet Şerîf Wanlî, ji bo kurmanciya jêrîn Cabar Qadir, ji bo rûsî Prof. Lazariev, ji bo îngilîzî Mehrdad Izady. Komîteyê peywira niqandina edîtorê ji bo kurmanciya jorîn û du kesen alîkar da Edîtorê Giştî İsmet Şerîf Wanlî. Li gorî tevdîran wê ansîklopedî di nava du salan de amade bibe.

S. TAN

## TÎSK



SIRWAN REHÎN

Zimanê kurdî û  
zaravayênd wî

**M**amoste Amed Tigris, di nivîseke xwe ya di rojnameya Azadiya Welat de (5-11 Gulan 1996), der heqê MED TV de, nivîsek nivîsandiye û wiha dest pê dike: "Programên MED TV yên ku bi zimanê kurdî têñ pêşkêşkirin, ji aliye zimên ve gelekî qels û jar in." Berî her tişti mebest ji zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn e.

Ji xeynî wî tişti, gotinê mamoste pir asayî ye, lê ew a ku ne asayî ye û tiştekî zor seyr e, ew e ku di êvara 24.06.1996'an de, em rastî nivîseke din a wî têñ ku ji Navenda Nûçeyan a MED-TV re şandiye. Di wê nivîsa xwe ya dawî de, ji hêla devokêñ herêmî ve, bi awayekî vekirî pêşketinê dibîne. Lê belê di nivîsa xwe ya Azadiya Welat de, gotibû: "Mirovên ku di salekê de, bi pêş neketin, 20 sal jî derbas be, tu guhertîn û pêşketin çênbâbe." Êdî ev pêşveçûna vê dawiyê ku mamoste dibêje, min fêm nekir çawa wisa bi lezgînî çêbû!

Mamoste Tigris dînîvîsa xwe ya ku ji MED TV re şandiye rexne û gazinê xwe wisa tîne zimên: "Bernameyên ku bi zaravayênd kurmancî, soranî û dimîlî têñ pêşkêşkirin, her yek di cîhana xwe de, bi serê xwe ye. Tu têkiliyênekî bi yê din re tune ye. Mirov dibêje qey her yek zimanekî bi serê xwe ye. Her yek armanceke wê yê cûda heye. Her yek ji rîxistin û dezgeheke din e. Yek ji zimanê yê din fêm nake...." Û pişt re dest diavêje zaravayênd kurmanciya jêrîn (soranî) û dimîlî jî. Mamoste dixwaze ku (êvarbaş) têxe şûna ciwantirîn selaw, (ne selavêñ ciwantirîn) wekî ku wî nivîsandiye.

Her wiha mamoste dibêje: "Yên ku bi rîkokî 'bahsa' erebî bikin 'bas', gelo dê çawa yekîtiya zimên biparêzin û bi pêş ve bibin? Hinek soran bi rîkokî, dibêjin: "Me bi salan, di radyo û TV'ye de gotiye dengûbas û gelê me wiha fêr bûye." Nizanim ez van gotinan fêm nakim, yan di eslê xwe de seyir in. Ma qey mirov rîxistin û dezgehîn wî cûda bûn, gereke zimanê wî jî, cûda be? Êdî mebest ji "Her yek ji rîxistin û dezgeheke din e" ci ye? Ev tişti hemû li aliyekejî û gotinê ku ez dixwazim li ser rawestim mijara destavêtine zaravayênd din e ji aliye kesen ku wan zaravayen nizanîn ve. Bi fêrbûna çend gotinê wekî "Biraderekan, Ciwanekan, Şewtan baş hwd." mirov nikare zaravayekî mîna kurmanciya jêrîn fêr bibe. Ewê ku vê jî nizane tê dest diavêje zimanê erebî jî û dide selmandin ku basa me ji behsa erebî tê.

Li vir ez dixwazim li ser vê 'bas'ê çend tiştan bibêjim; Bav û kalêñ me bêyî ku erebî bizanî jî, dîsan ku rastî hev dihatin ji hev û din re digitin; "dengûbas ci ye?" yan jî, tê gotin "dengûbasê bajarê we, gundê we hwd."

Di beyt û serpêhatiyênd kurdî de mirov dikare ji bo heman mijar vî tişti jî bibêje: "Heyase le dîwexan ci bas e". Ev ji zû ve di nav gel de heye. Êdî çawa A.Tîgrîs 'bas' kir ya ereban, bi rastî jî min fêm nekir. Nizanim çîma em ji bo selmandina ramanê xwe yên şaş mala zimanê kurdî jî xera dikin! Pişt re havêna zimanê yekîtiyi bi tenê xebitandina 'nûç'ye ye? Lewre berî ku tu hesabê 'bas'ê ji hin kesen bipirsî, ew hesabê bi dehan peyvîn erebî ji te dipirsin;

"îkaz, mudexeple, intîxar, sewqiyat, suîqast, qatîl, mantîqê, qetîlam, îspat, aynî, işaret, telof" û bi dehan peyvîn din ci ne? Ma ne erebî ne ku her roj di zimanê nûçê û bernameyên din de dubare dinin? Di wê mijarê de MED-TV pir bêxem bûye. Heya niha 3-4 zimanzanêna baş anîn cem hev ku çareyek ji rewşa zimanê TV'ye re bibînî? Heke ku berê guftûgoyen zanistî li ser ziman çêbûbûna, niha kekê Tigris hesabê basê ji me nedixwest û çareyek ji bo zimanê tevliheva TV'ye didit, ew peyvîn erebî û biyanî ji holê radikirin ku her roj bi dehan car derbas din. Pêşîyan kurdan pir xweş gotiye: "Şûjina di çavê wî de nabîne, lê qîşê di çavê min de dibîne."

# Ji folklorra Botan çend rêz

**D**i Rojhilata Navîn de ji aliyê folklor bi devkî ve Kurdistân cihekî girîng û pêwist digire. Her çiqas xak û dîroka vî welatî di bin lingên dagirkeran de hatibe perçiqandin jî, iro bi saya folklor; stran, lawje û klamên kevneşopî û herêmî çand û hunereke pir hêja hatiye afirandin. Folklor li çar aliyê Kurdistanê bi cureyên dewlemed tê xebitandin, lê folklorra Botan bi serê xwe bûye ekolek.

Ez xelef im..  
Ez xelef im Xelef im  
Hawar e, mîro hawar e  
Xwediyê şûrê sedef im  
Nav eşîra seref im  
Hawar e mîro hawar e  
Êzdînşer, begê Botan e

Ez Xelef \*Şûvî me  
Hawar e mîro hawar e  
Xwediyê şûrê misrî me  
Nav eşîra Keyfî me  
Êzdînşer, begê Botan e

Ez Xelefî kinik im  
Hawar e mîro hawar e  
Xwediyê şûrê nedrikim  
Nav eşîra kîf dikim  
Êzdînşer, begê Botan e

Ez Xelefî Uso me  
Hawar e mîro hawar e  
Xwediyê şûrê darço me  
Nav eşîra de cûme  
Êzdînşer, begê Botane

Herwexê xweş Herwexê  
Hawar e mîro hawar e  
Me şere li ser Şernexê  
Topa mezin li wê rexê  
Êzdînşer begê Botan e

Ez Xelef im xelef im  
Hawar e mîro hawar e  
Herwexê wa bilind e  
Me şerê li ser firing e  
Topa mezin wa li nik e  
Êzdînşer, begê Botan e

Herwexê wa li kortê de  
Hawar e mîro hawar e  
Mîrê Botan ket tê de  
Hespê Xelef wa li rê de  
Êzdînşer, begê Botan e  
\* \* \* ehm ran  
Şehmîranê Şehmîranê

Mala bavê şehmîranê  
Cû vekirin av berdanê  
Av berdane ji Gola Wanê

Şehmîranê Şehmîranê  
Mala bavê Şehmîranê  
Şehmîranê cilka şüştin  
Zend û bendê zer malîstîn  
Kurê xelqê ji rêka hiştin

Şehmîranê Şehmîranê  
Mala bavê Şehmîranê  
Li Şehmîranê cil kutane  
Zend û bendê zer hildane  
Kurê xelqê ji rêka mane  
Mala bavê Şehmîranê

\*Şûvî: Xelqê ji gundê Şûv, ku gundeki  
Perweriya Sîrtê ye.

\*\*Şehmîran: Li Wanê cuheke avê; tê  
diyarkirin ku heta axirê zeman  
xera nabe

Melazgir  
Melazgir hoy Melazgir  
Narê hoy Narê  
Ordeka gol xelas kir  
Çavrêşa dêm qiyas kir  
Sorgulê yemanê

Melazgir hoy Melazgir  
Narê hoy Narê  
Melazgir şal heşîn e  
Tevda spîndar û bî ne  
Gewra min xemrevîn e  
Sorgulê yemanê

Melazgir wal kortê de  
Narê hey Narê  
Çil qızén ewliya tê de  
Gewra min ji hemiya wê de  
Sorgulê yemanê

Melazgir hoy Melazgir  
Narê hoy Narê  
Melazgir tu ava bî  
Tev de gul û giya bî  
Azado tu zaya bî  
Sorgulê yemanê.....

Ser av xuryok  
(Heyran )  
Serçav xuryokê ziman giranê  
Ez û Heyranê biçine avêyo  
Wê bê pêşîya me siwarê xelkêyo  
Wê ji me bistîne şala pişteyo.

Heyran Heyranê  
Ez û Heyranê biçine guniyan  
Wê bê pêşîya me siwarê Romiyan

Wê ji me bistînin şar û kefiyan  
Heyran Heyranê  
Ez û Heyranê biçine qırışka  
Wê bê pêşîya me siwarê Alika  
Wê ji me bistînin cotê memikan

Heyran Heyranê  
Ez û Heyranê biçine nav reza  
Wê bê pêşîya me siwarê çerkeza  
Wê ji me bistînin maç û geza

Heyran Heyranê  
Ez û Heyranê biçine nav nîska  
Wê bê pêşîya me siwarê Lalîska  
Wê ji me bistînin cotê gîska.....

Xezala

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Reşkon in li berya jêri

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Kur şivan û keç bêri  
Çi bikim tu jina mîr i

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Konê babête çit e

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Sera koçik û şelit e

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Jina spehî felît e

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Konê babête li ba ye

Xezala min delala min  
Hey yêri yêri yêri  
Xezala min delala min  
Jina spehî bela ye.

Heylo day  
Min dîlan kir te dîlan kir  
Heylo dayê heylo dayê  
Min desmala cargoşe kir  
Goşekî ji goşê zêde kir  
Heylo dayê heylo dayê  
Berkê rû sorgula min

Ey axa pîroz!  
Doh ew parazvanê  
te bû  
Hêviya me îro ji te ye,  
ji ber îro dora te ye....

Çûme mîrgê mîrg û kani  
Heylo dayê heylo dayê  
Min giya dirût te hilanî  
Heylo dayê heylo dayê  
Min şîv û hespê lawik anî  
Berkê rû sorgula min

Çûme mîrgê Elî yê Silo  
Heylo dayê heylo dayê  
Min giya dirût te kir mila  
Min da zérê çar çimbila  
Min ji yarê re daye kila  
Berkê rû sorgula min

Çûme mîrgê mîrg û bestî  
Heylo dayê heylo dayê  
Min giya dirût te kir destî  
Şîva hespê lawik xwestî  
Berkê rû sorgula min

Gir s ra bi s r e  
Girêşîra bi sîr e lê lê lê Meyro  
Du siwara hêl û hir e  
Xwestiyê Meyro wezîr e  
Tolî ciwanê Seyro

Girêşîra genim e lê lê lê Meyro  
Du siwarê rim û rîm e  
Xwestiyê Meyro hâkim e  
Tolî ciwanê Meyro

Girêşîra bi ce ye lê lê lê Meyro  
Du siwara heyo heye  
Xwestiyê Meyro file ye  
Tolî ciwanê Seyro

Girêşîra pîvaz e lê lê lê Meyro  
Dû siwara gaz û gaz e  
Xwestiyê Meyro tolaz e  
Talî ciwanê Seyro

Girêşîra bi nok e lê lê lê Meyro  
Du siwara huke huk e  
Xwestiyê Meyro zarok e  
Tolî ciwanê Meyro

Ala ala ala

Ooooooo

Ala ala zavayê kala

Mişkê bi dîwarê bî

Mişko da dehlê de

Bilûr ber pişte de

Hetanî memê de

Memê ji tayikê biyê

Şila ser kaniyê

Kuştin li xerîbiyê

Li xerîbiyê deyn neke

Bêjîn ço ço ê ê neke

Bela Misto ji me veke

Dindilxan

Dindilxan Didilxanê

Serbanê haci Salihê hemanê

Eyşo û Fato da ber kînoşkanê

Safî Qurbanê, Hedo xulamê

Dindilxan Dindilxanê

St legleg

İsa stû legleg

Bavê trênenê

Diya qamyone

Navsera çiyayê deşta Hêne

Klorêن wê, li ber derê dirûnê


Jê re dibêjin İsayê mîre Şîrinê.

BERHEVKAR:

SALIHÊ KEVIRBİRİ



Oxir be ji te re xwişkê  
oxur be  
Hezar rehmet  
li gora te be  
Tim şehîdên Kurdistanê  
Çi keç û çi xort  
li benda te ne.



Lokman Yorulmaz 1969

Li ser navê malbatê wan Salihê Kevirbirî – Qasimê Dengbêj

# Ji Weşanxaneya Avesta pirtûkeke ezîz

**H**eke nivîskarek dema ku berhemekê diafîrîne bixwaze wê berhemê bi xwendevan bide qebûlkirin, bi xwendevan bikaribe bide xwendin, tamekê wisa bide bin zimanê xwendevan, pêwist e hin tiştan baş tehlîl bike. Xwendevan ji xwe dûr nexe, bila ew berhem nebe berhemeke ku bi tenê bi kurdî hatiye nivîsandin, bila bibe berhemeke edebiyata kurdî, bila xwendevan tameke wisa ji berhemê bistîne ku bixwaze ne carekê bi caran bixwîne.

Pirtûkeke çirokan a Helîm Yûsiv bi navê "Mirî Ranazin" ji aliye Weşanxaneya Avesta ve hate weşandin. Pirtûk ji du beşan pêk hatiye; besa yekemîn bi navê "Mirî Xweşik in" ya duyemîn ji "Mirî Ranazin." Di her besêkê de çend çirok hene. Lî çirokên wisan e ku mirov dikare bibêje bi rastî jî heta îro tiştine bi vî rengî nehatine nivîsandin. Di destpêka pirtûkê de hevokke wiha heye "Ji bo Apê Mûsa Anter: Tê bîra te, ew dara ku te li hewşa xwe çandibû va ye... di ser dîwaran

re saxên wê gihiştine hewşa me jî li Amûdê" ev hevok bi serê xwe maneyeke girîng dide pirtûk û çirokan. Her wiha çirokên ku Helîm Yûsiv mirî kirine mijar ji bo Apê Mûsa û ji bo kurdên nemir 'Mirî Xweşik in', 'Mirî Ranazin' ve nemirîbûna wan bi bîra xwendevan dixin.

Pirtûk bi zimanekî sivik, hê-

san, rojane bi vegotinê kurdî hatiye nivîsandin. Nivîskarê pirtûkê ji Başûrê Biçûk e, lê her xwendevan dikare ji vê pirtûkê bi hêsanî fêm bike. Qehremanen çirokan mirovîn ji rêzê ne, taybetiyen wan an dîn in an mîrî ne an ji bi xeyalê xwe ve bi dijmin re şer dîkin. Ev taybeti bi her awayî di nava jiyanê de hene, bi serê xwe ne, bi hev re ne, rewşa ku kurd tê de ne; bi awayekî giştî tînin berçavan. Qehreman çirokan bi zindîyan henekîn xwe dîkin, didine xuyakirin ku wa ye ew dîn komarekê ava dîkin, lî hê jî kurdan komarek ava nekiriye. Nivîskarê pirtûkê Helîm Yûsiv, bi miriyen dîn komar dide avakirin, psikolojiya miriyan û dînan bi awayekî tehlîl dike û her kesen ku di komarê de cih digirin ji bi taybetiyen wan bi awayekî pêşkêşî xwendevan dike ku guyana kurdîtiyê tev tê de tê dîtin.

Rojekê ezê....

Bî dîtin û xeyalê zarokekî têkoşîna ku li hemberî dijmin tê dayîn tîne ber çavên mirov. Zarokek nikare li hemberî dijmin tiştekî bike, lê ji xwe re ramanan ava dike û bi van ramanan bi dijmin re şer dike; dema ku ramanê wî diqedin, bi dilekî şewitî hundirê xwe davêde derve 'Rojekê ezê.... bikim.' Tadeyî û pêkûtiya dijmin tîne ber çavên mirov.

Li welatekî bêhnekê ji çiyayekî bilind dibe û bi hezaran tank, top, balafir, leşker dixwazin wê bêhnê biçewisînin, lê tu kes nikare wê bêhnê biçewisîne. Lî her roj ew bêhn zêde dibe, bilind dibe, li her derê belav dibe. Ev ji têkoşîna gelekî bi vî awayî tîne ziman.

Lê orf û adetên me ku me dixine nava qalibê teng, nahêle em bi jiyanek serbest bijîn, ew ji dîbin sedem ku em nikarin bi mirovan re têkiliyan deynin, rengê têkiliyan xwe kifş bikin. Di çiroka "Dilê bê derî" de, ji vî aliye ve jiyan me tîne ber çavar. Di çiroka "Reşikê Şevê" de ji, li ser tirsê û psikolojiya ku tirs li ser mirov çedike disekine.

Bi kurtahî berhemeke hêjâyî ku mirov bixwîne û binirxîne ye. Berhemên bi vî rengî ez bawer im wê di wêjeya kurdî de qonaxeke nû vebikin.

METİN AKSOY

rastiye....

Bûyer û tevgera komeleyetî...

Xêr nake. Em di guhêne ga de dijîn.. Haya me êdî hew ji cîhanê û bûyerên cîhanê maye. Haya me êdî hew ji dîtin û lêkolînên zanyaran maye. Me, bi destêne xwe, xwe xistiye rekiheke hesinî. Konekî kejî koçerî ji bi ser wê rekihe de kiriye. Çirûska ronahiyê nakeve hundir. Reşika çavên me ji, körkî bûye, ji ronahiyê diricife. Dilê me lê dixe, mixabin cewher pûc bûye. Çakûçê dil, çiqasî bi hêrs û hêz li sidanê kevçika dil dikeve ji, deng nade. Deng bide ji, guhêne me ker bûne, me ne bes reşika çavên xwe bi ava reş şûştiye. Me, ne bes cewherê dilê xwe di nava zingar û gemarê de pûc û xîş kiriye. êdî me, kerika guhêne xwe ji bi xweliya rîjîye dagirtiye. Êdî çavên me tu bûyer û tevgeran nabînin. Dilê me, şewata waweylê ye, bêhnê nade. Guhêne me qîrîn û awaza zar û zêçan nakin.

Bêguman cîhan dizîvire. Bi vê zîvîrandinê re demen salê derdi Kevin meydanê. Bi demen salê re ji komên xelkê xwe diguinerînin?

A  
V  
A  
S  
I  
N

avaşin



Bîtar 1 1996

Kovareke bi navê "Avaşin" ku ji sé mehan cakrekê li Berlinê ji aliye hin rewşenbirê kurd ve tê weşandin, bi hejmara yekemînî derket pêşberî xwendevanen kurd. Avaşin kovareke çand û hunerî ye, nivîsen bi çesnên cur bi cur wekî, kurteçirok, helbest, gotar û hwd. tê de cih digirin.

Di hejmara kovareye ya yekemîn de nivîseke Serkê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan der barê romana kurdî de bi navê "Jiyanê çawa bersiva romana şoreşê ye?" helbesteke şairê filistinî Mehmed Derwêş ku ji bo kurdan nivîsandiye, bi navê "Em bi we re ne", helbesteke M.E. Pêncêwînî bi navê "Bazî çawres", helbesteke Xamevan bi navê "Bang", helbesteke Î. Omerî bi navê "Konê serxwebûnê", çirokeke Zana Farqînî bi navê "Birîna axîfi derbû", çirokeke Bavê Nazê bi navê "Nexwaşî û mirina Apê Ehmedo", çirokeke gelêri ku ji aliye Abas A'lan ve hatiye berhevkirin, nivîseke Serkan Birûsk bi navê "Çend bîstik ji şoreşê", heppiyînec bi Arsên Polatov re, helbesteke Hemîd Bedîrhan bi navê "Leşkerê hêviye", nivîseke Amed Tigrîs der barê tevliheviya di gotinê pêşîyan û biwêjan de, nivîseke Esat Feraşin bi navê "Efsaneyâ qertelekî" û hin nivîsen edebî, hunerî cih digirin.

Kesên wekî Dilbixwîn Dara, Amed Tigrîs, Bavê Nazê, Sîrwan Rehîm, Xemgîn Bîrhat, Abdullah Uzun, Necip Balayî û hwd. di nava redaksiyonê de cih girtine. Tevî vê yekê ji di nivîsan de hînek kîmasiyen rîzmanan û rastnivîsê bi ber çavên mirov dikevin.

pêwistî haziriya pêşerojan dîkin. Ba û bahoz û bablîsok pir bi hêz derdi Kevin holê. Têkçûn ji, têgîhiştin ji li devê derî ye. Careke din gidî, careke din em ji xewrebezê xwe nakevin.

Dem di tevgerêke wilo de ye. Kurd ji, li ser tixûbê têkçûn û têgîhiştinê ne.

Qonaxek wilo ye ku mirov bîst û çar saetan nebeze, nikare birûmet bijî. Ev tevger di guhertineke wilo de ye ku 24 saetan mirov ne hişyar be wê têk biçe.

Hin mirov ji hene ku berpirs in. Sibe tawanbarî û gunehkariya vê berpirsiyê ji wê bê ser masetê.

Gelo çand û pêşketin, an ji ademiyet ne danûstandin e? Di vê danûstandinê de rahiştin û girtin e. Ku bê guhertin e.

Gelo, em vê rahiştin û girtina şaristanî çiqasî ji gorî xwe û ji bo komên xelkê xwe diguinerînin?


Yan em di vê rahiştin û guhertina hemdemî de ku navê wê modernîzasyon e, yan ji ademiyet û şaristanî ye winda dibin? Kula çirizokê, li mala demê datîne şev û rokê.

Helîm Yûsiv

MIRÎ RANAZIN

Nameyeke giştî

MEDENÎ FERHO



L i gorî ciwamêrekî materyalist, hewn, rê û livandina jiyanê pêk nayîne, berevajî vê, jiyan rê û livandina hewn nîşan dide...

Marx û Engels ji, qebûl kirine ku lebat û livandina rastî bes ji tişt û bûyerên rastiya dertê..

Li gorî ciwamêrekî materyalist, jiyan rolê dileyize. Li gorî Marx û Engels ji, tişt û bûyerên rastivê, ci bûyer û ci di tevgera komên xelkê de rîberiya politîk vê rolê dileyizîn. Hîmê tevan li ser bingeha jiyanê ye. Her du dîtin ji ragihandina bingehîn avaniya tevgerê li ser jiyanê diidin rûniştandin.

Jiyan û rastiya ji tişt û bûyerên

# Bozo û qumandar

**B**ozo, mirovekî ji gundê Herbê, hêla Nisêbinê ye. Pişti sê salan leşkeriya tirkan dike, çend bêjeyen tirkî, mîna gît û gel hîn dibe. Tevî vî halê xwe jî, li vegevê dibe keyayê gund û rêberê herêmê. Ji ber ku mîrek bi tirkî dizane û wergêrê zimanê tirkî ye li herêmê; her kes hewcedarî wî bûye û bi nav û deng bûye.

Wê demê mayin li tixubê navbera Tirkîye û Sûriyeyê tunebûn. Mîşextan (qaçaxçîyan) bihayê ser û barê xwe didan leşkerê qereqola ku berevaniya tixub dikirin û derbasî Sûriyeyê dibûn.

Rojekê karwanê herêmê biryar

digire ku biçe Sûriyeyê. Ji ber ku Bozo bilbilê zimanê tirkî bû û bi nav û deng bû; pêşengî û rêberiya karwan dispêrin wî. Dema karwan nêzîkî qereqolê dibe, li talda girekî radiweste. Bozo diçe qereqolê ku bedêla ser û bareñ xwe bide, da bi serbestî biçin binya xetê. Leşkerê nobedarê qereqolê ji Bozo dipirse: "Kaç baş eşeginiz vardır? (Çend kerê we hene?)" Bozo dibêje: "Sizlen beranber girmi tanedir qumandarım (Tevî we bîst ker in qumandarê min)" Yê leşker pê de dixeyle; xwe tal dike û dîsa dipirse: "Ulan kaç baş eşektir? (Kuro çend ker in?)" Bozo dibêje: "Qumandarım, ma yalan söyleyim. Wele, tile,

bile sizlen beranber girmi tenedir (Ez rast dibêjim ma ezê derevan li we bikim, weleh, bileh, tileh tevî we bîst in)." Yê leşker hêrs dibe, şimaqekê lê dide û dibêje: "Tu tina-zên xwe bi min dikî." Bozo ji bazarê digere û li hevalên xwe vedigere.

Hevalên wî jê dipirsin "Ka te çi kir; te riya binxetê ji me re vekir, ango tu û qumandarê qereqolê, we li hev û din kir?" Bozo dibêje: "Na wele me li hev nekir. Kuro ev jî bextreşıya me ye. Segbavek ecemî hatiye bûye qumandarê vê qereqolê, bi tirkî jî nizane. Min kir û nekir li peyva min neket..."

Î. OMERÎ

**H**emoyê Qaso ji gundê Beyboya Misircâ (Kurtalan) ku li ser Sêrtê ye. Her dem li civatan, pesnê xwe bi tirkî ya xwe dida. Çend peyvîn tirkî hîn bûbû û ji wî we ye ku perê şeytên şikandiye. Hew çend ji xwe qayîl bû; pişti demekê Hemoyê Qaso dizewice. Lî belê vê carê jî ew û jina xwe dikevine qirika hev. Ji aliyê pêşdayînê ve jina wî hê jî, jê xerabtir bû. Wey li wî ku digotin "Tirkîye min ji tirkîya te çêtir e."


Rojekê ji rojan, Hemoyê Qaso diçe leşkeriyê. Leşkeriya wî xelas dibû û tê malê, berê xwe dide jina xwe û wiha dibêje: "Hermet bi Xwedê ez zehf baş hîn tirkî bûme." Jina wî jî di binê gotinê de namîne û ew jî diyar dike ku ew hê bêhtir hîn bûye. Dibê êvar dikevin nav nivînên xwe, wê çax dengek ji pişti derî tê. Hemoyê Qaso vediçiniye û wiha dibêje: "Jinê! Jinê o ne xirexîrdir li pişti derî? Jinik jî bersivê dide:

– Sa nesî belkû pisiktir.

S. MISIRCÎ

# Şêx Gulê

## û tirkî



exerê gundekî li ser navçeya Qubînê ye. Di vî gundî de heyâ vê dema dawiyê, bi piranî kurdên êzidî dijiyan. Şêx Gulê jî yek ji wan bû. Tebatî bi Şêx Gulê nediket, ku ew rojê carekê neçuya Qubînê. Wexta ew diçû Qubînê gundiyan qewîti lê dikirin. Wê jî tim qewîtiyê wan bê kîmasî bi cih dianîn.

Di sala 1971'an de dewleta tirk bi şiklekî taybet zimanê kurdî qedexe kiribû. Êdî mirov nikaribû ne radyoyen kurdî yênen mîna Êrivanê û Bexdayê guhdarî bike, ne jî li malê û sükê bi kurdî bi avixe.

Şêx Gulê rojekê disa berê xwe dide Qubînê. Heçî kesen di rê de rastî wê ten, jê re dibêjin ku axaftina bi zimanê kurdî qedexe ye. Ji ber wê yekê jî divê ew li sükê bi tirkî biaxive. Lî belê ew levzekê jî bi tirkî nizane.

Şêx Gulê ji bo ku qewîtiyê gundiyan xwe bi cih bîne, berê xwe dide dikana Hecî Remezan. Wê du kîlo şekir bikiriya. Ew dîsa di rê de difikire, ka ewê çawa bike. Divê ew qewîtiyê xwe pêk bîne, kurdî qedexe ye û ew bi tirkî jî nizane. Ew bi dilekî şikestî berê xwe dide dikanê. Wexta ew dikeve nav dikanê, dibêje firoşkar: "Hecî Remezan, ka bi tirkî du kîlo şekir?"

MAMOSTE EMİN

## Belkû pisiktir

### XELAT...

	S	D	R	A	E	T	A
Lazapt	F	I	P	E	L	C	A
Leşkeri	L	E	H	T	R	R	I
Zirek	S	A	X	S	E	D	A
Çox	N	E	Y	N	A	V	E
Zirek	S	A	R	A	R	A	Y
Çox	J	T	R	M	A	K	
Zirek	K	O	T	R	D	A	
Çox	J	I	E	V	A	R	
Zirek	S	I	N	G	A	N	T
Çox	PEYVA VEŞARI						ROJNAME

### Bersiva Xaçepirsê (23)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigîhîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.


Xelata hejmara me ya 25'an kitêba Medenî Ferho 'Berkwedan Jiyan e' ye Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyen li bin xaçepirsê de binivisin û tevi adresâ xwe ji me re bişînin.

Kesên ku xelata xaçepirsa 23'an, kaseta Hozan Şemdin "Ka Bûka min" qezenc kirine: Aziz Özer/İstanbul, Osman Bor/Kuşadası, Abdurrahim Yenipazar/Mersin, Aytaç Öztemel/Bartın, Samet Üzyir/İzmir, A.Kadir Uğurlu/Mardin, Binnur Açış/Bursa, Nuri Özen/İzmir, B.Uçaman/Diyarbakır.

### XAÇEPIRSA BIXELAT (25)

Kitêba pîroz wêne	Avahîya kayê Ban, bilind	Sembola Terbiyümê Rastkêşde	Serbesti Belavbûn, deng	Hozan, helbestvan	Manîvela
Derece					
Hestiyê masiyan			Notayek		
			Maki		
			Mehek		
Romanekê Emile Zola Sembola Hîdrojenê			Li stuyê gay gir-didin Dîn		
	His, dep	Notayek Gelek			
Jî texteyan cihê rûniştinê	Li keran dîkin Çav				
Zirek Li Latin Amerikayê çiyayek	Qey Ling				
	Li ser nameyan datinîn				
	Doşina pez				



PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5 6 7 8



# Azadiya Welat û miletê kurd

**C**ayê Azadiya Welatî miletê kurd het çiçyo? Nika şima dê vajê, no kot ra vejiya. Béguman madê ci-wabanê ïnan bidim. No rojnameye ki şima dest di, 25 hefteyo Stenbol di vejiyeno. La belê miletê kurd nê rojnameye xo çiqas genê, çiqas wanenê? Ma wina jew çim çekin ci. Ma ki çim çekard ci, wina tevayî vejiyame ver: No rojnameyî ma heme ciyê mawo. Jû milet esta se, ziwanê ci jî esto; çanda ci jî esto; dîroka ci jî esta. O waxt rojname, kovar û televizyonê ci jî gerek bibê. Nê mebê se, na milet neşena ziwan dê xo di qisey bikiro, nejî dîroka xo rind şena bimûso. Nê mebê se dîroka ci, çanda ci, ziwanê ci bêne sanik (istanik).

Eger may nêwazemi dîrok, çand û ziwanê ma sanik bê se, ma ziwandê xo di qisey bikimi, ziwanê xo di binûsimi. Ma ki wina mekim se, sanik ra nêxelsiyami, ma azadî

nêbemi, ma cahîl manemi.

Bewnê verdê se sar Mîqdad Mîthat Bedirxanî rojnameyî kurdi sıfeyîni (1898) Kurdistan vedibi. O waxt çiçî nûstibi. Mixdad Bedirxanî nûstibi ki ewro miletê kurd azadî nebiya se, welatê xoyê azadî nênavo rose, miletê kurd cahîl mende se, ziwanê xo de nêwendo û ziwanê nênusto, qandê coya wo. Raşt vato, qandê ma ewro jî wîniyo. Miletâ kurd çiqas ziwanê xo di wanena û çiqas nûsena? Eger ziwanê xo di biwane û binûse se ewro Azadiya Welat du hezar panceş- hîrê hezarî nê, çewres, panceş hezar roşayî. Ewro wîni niyo, no eybî miletê kurd niyo çiçyo? Miletê kurd rîndîn wazena, azadîn wazena, ziwan di xo di nêwanena, nênuşena. O wext wina teva yeno kesî vîrî, miletê kurd nîna qiseyan di wazena. Ya jî hemi cî gerîlayan ra pawena, gerîla hemi cî neşena ku bido milet, gerîla girweyê xo ke-

no, milet jî girweyê xo bikro. Gerîlayan rê heveyê alîkarî bikrê, ewro heme cî gerîlayê kenê. Heveyê jî milet tevayî bikro. Ewro miletê kurd gerek müseyanê xo verînan vîrî, ziwanê xo, çanda xo, hera kiro. Ma ki wina kardi se, gerîla rê jî alîkarî beno. Jew bî ïnan rê alîkarî nêbeno.

Azadiya Welat senî ki vejiyayısti gerek hema herkes bigiro, biwano û bido biwendîş, badê nê rojnamey ma rê binûso û birêşê. Ewro kurmancî tayn bû se jî iyê ma rê nûsenê û reşenê. Mayê wazemi niwe tepiya dimbili (kirdki) ma rê binûsê, birêşê. O waxt Azadiya Welat di dimbili daha zaf vejiyeno. Ma wina kardî di rojê rîndî, rojê azadî yenê nezdî. Berê ma pêro piya ziwanê xo di biwanêmi, binûsimi û nê eybî pêro piya hewadimi, raya miletê xo roşnî kimi.

MEMED DREWŞ

listikên polîtik hin berjewendîyan ji wê cografyayê bidest bixin. Dewleta tirk jî ji bo eynî tişti şerekî qirêj li hemberî kurdan bi qetîşamîn girseyî dimeşine.

Di vê mijarê de rola MED-TV'ye dertê pêş. Yanê MED-TV'ye ev polîtikayên kirêt û qetîşamîn teşhîr dikirin. Di vir de ez mînakekê bidim kovara Alman "Focus" ku ji destpêka şoreşa kurdan heta vebûna MED-TV'ye li dijî PKK'ye weşan dikir, lê pişti girtina MED-TV'ye lêborîna xwe ji gelê kurd û MED-TV'ye xwest. Mebesta lêborîna xwe jî wiha diyar kir "Me heta vebûna MED-TV nizanibû ku dewleta tirk zîlm û zordariyê li gelê kurd dike" rola MED-TV'ye wiha derdikete pêş.

Minakeke din berî çend mehan li Moskovayê radyoyeke ku bi kurdi weşan dikir hebû, çend hefteyan weşan kir û dewleta tirk jî bo girtina radyoyê 200 hezar dollar da Rûsyayê û girtin.

Dewleta tirk heta ku ji destê wê bê bi teví imkanen xwe seferber dike; ci madî, ci manevî, ci bi ser dixwaze mîtingeriya xwe bidomîne û hin derfetan pêşkêşî dewletê imperialist jî bike.

Mebesteke dewleta tirk jî ev e; ew bi vî awayî li ser kurdan şerekî psîkolojik jî dimeşine. Yanê li ber kurdan ji xeynî ku xwe bispîrine dewletê tu rê dixwaze ku nehêle.

Wekî çawa ku di kongreya HADEP'ê de provakasyonek pêk anî û bi vê jî dixwaze rê li ber aşîxwaziya kurdan jî bigire.

Li gorî lêkolînen dewleta tirk û Amerîkayê MED-TV li 34 dewletan û bi 6 zimanî weşan dikir, 50 milyon temaşevanen MED-TV'ye hebûn, ew her roj jî zêdetir dibûn. Ji aliye hişyarkirina gelan ve li ser polîtikayên dewleten împeryalist û mîtinger MED-TV xwedîye risteke taybet bû. Li aliye din ji bili CNN'ê tu televizyonen ku li rûyê dînyayê rojê 6 saetan weşanê bike û 50 milyon temaşevanen wê hebin, tune ye.

Divê em jî li hemberî van polîtikayên kirêt ku qetîşama û asimîflasyona gelê kurd pêk tînin, tewra xwe deyîn, yanê bêdeng nemîn. Bêdengî têkçûna daxwazan e. Pêwist e mirov tiştekî ji bir nekin heta sala 1992'an bi kurdi axaftin qedexe bû. Lî têkoşîna ku tevgera azadiyê da, pir daxwazan dewletê têk birin û bi zimanê kurdi axaftin serbest kirin. Ne daxwazekê dewleta tirk bi sedan daxwazan dewleten mîtinger û împeryalîstan di bin şoreşa tevgera azadiyê de perçiqin.

Ci kurden li derveyî welêt, ci yên li welet, edî divê bi tu awayî rê nedîn ku ew dewlet polîtikayê xwe yê kirêt bimeşine. Li hemberî wan jî destê kî ci tê divê bike.

M. AGIRI

**WELAT**

Rojnameye Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi).  
CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMÎ TAN  
RAHMÎ BATUR

Berpîrse Karêñ  
Nîvîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrse Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELDDEMİR

**NAVNIŞAN**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL-FAX**  
(0 212) 293 53 19,  
251 90 13

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.

**BELAVKIRIN**  
Biryay Dağıtım  
(BİRYAY)

**NÜNERİTYÎN ME**  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Gişî  
yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost,

Helim Yûsiv  
Berlin:

Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robin Rewsen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Remzi İlhan  
312 06 32 31 28

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Ji bo ku jiyana ges bibe çar gul weriyabûn...



M. Hayri Durmuş



Akif Yılmaz



Kemal Pir



Ali Çiçek

**E**v şanzdeh sal in li vi welaî her ku "ilah"ên veşarî û yên eşkere bêhteng dibin, dev diavêjine girtiyen hepsan; mafê wan ên insanî binpê dikan û dixwazin wan ji bir û bawerîya wan dawesînin. Girtiyen bêcek û bêhêz ji, her car ji can û rihe xwe diborin, lê ji bir û bawerîya xwe û ji mafên xwe naborin...

Ji bo parastina maf û bir û bawerîya xwe, di nav wan salan de bi dehan girtî jiyana xwe dane. Hinekên wan bi lêdan û işkenceyê hatine kuştin û hinekên wan ji bi xwestek û zanîn, xwe avêtin hembêza mirinê.

Rom, di warê siyaseta xwe ya zîndanê de ji bêbextiyan diyar dike: Her ku mafan binpê dikan û girtî birik û inad, bi cane xwe mafê xwe diparêzin, ew mecbûr dimînin, gava xwe bi paş ve diavejin; daxwazên girtiyen bi piranî qebûl dikan; lê pişti demekê careke din girtiyen mecbûrî mirinê dikan.

Dizanîn ku, di daxwaza xwe de serfiraz nabin, lê dîsa ji her car xwe diceribîn ku iradeya girtiyen bis-kênin. Û her car girtiyen tînin sînorê mirinê (carinan ji wan ji wî sînorî ji diborîn) û pişt re ji wekî ku se-re xwe li zinarekî dabin; gava xwe bi paş ve diavêjin.

Kesî ku "Madem maf didine girtiyen ji bo çi hûn

vi mafî careke din binpê dikan, van însanên bêhêz û bêcek mecbûrî mirinê dikan!?" bibêje ji tune ye... Û yê romê ji, jixwe ne next e ne wîjdan û ne însaf...

## Girtîgeh: Cihê berxwedan û şikestinê

Ev du meh in ku, dîsa hilim û gulma melkemot û xezeba çavşoran xwe bi ser girtiyen hepsan ve xwar kiriye... Dîsa girtiyen di rojiya mirinê de, hatine li keviya mirinê sekînîne. Li derive, ji xeynî komek mirovîn bixîret kes li gaziya wan nahesîne; hawara wan di guhêن civakê yên ker de winda dibe. Lî tu dîwar nikare bi dûvdîrêji xwe li ber hawara wan a tûj bigire.

## Meha manîdar: Tîrmeh

Berxwedana girtiyen hat kete meha tîrmehê, 14'ê vê mehê di berxwedana zîndanê de rojekê pîroz e. Ji bo jiyan ges bibe, di vê rojê de çar gul weriyan (weşîyan).

Pişti ku Kenan hate ser kar, li hemû zîndanan, lê bi

Ev du meh in ku dîsa hilim û gulma melkemot û xezeba çavşoran xwe bi ser girtiyen hepsan de xwar kiriye...

Dîsa girtiyen di rojiya mirinê de, hatine li keviya mirinê sekînîne. Li derive ji xeynî komek mirovîn bixîret kes li gaziya wan nahesîne; hawara wan di guhêن civakê yên ker de winda dibe. Lî tu dîwar nikare bi dûvdîrêji xwe li ber hawara wan a tûj bigire.

taybetî ji li Zîndana Amedê xwestin ku girtiyen bi temamî ji insanîtyê dawesînin, wan bêşexsiyet bikin. Pêşî Mazlûm bi sê darikên niftê li dijî wê zilmê derket. Pişt re ji Çaran bi agirê bedena xwe roniyê bisikivandin. Û bi berxwedana 14'ê tîrmehê ji tarî çiriya, ronî bû...

Di 14'ê tîrmehê de komek girtî dest bi rojiya mirinê kiribûn. Dî rojiya mirinê de ne rojek, ne deh roj, pêncî-şest roj însan bi melkomot re dikevine pêşbazîyê, pê re berberiyê dikan. Ne hêsan e... Ku yek gav li paş bimînin, êdî nikarin serfiraz bibin. Hayri û Kemal ji beriya 14'ê tîrmehê xwe ceribandibûn. Lî bi ser neketibûn. Lewma Kemal di berxwedana 14'ê tîrmehê de "Divê nauheqeq ez vê carê serfiraz bibim..." digot û "bi ser" ket.

Di berxwedana 14'ê tîrmehê de Mehmet Hayri Durmuş, Kemal Pir, Ali Çiçek û Akif Yılmaz serê xwe danîn.

Hayri ji di reştarîyê de, ji hevalên xwe re wiha di-got:

"Qêrîn û hawara van mirovan tu carî ji bir nekin! Welatê me ber bi Vietnamê ve diçe..."